



Nesekine...

Nesekine li benda tu demsalê! Lewre her bendewarî windahiyek e di van rojên malkambax de... Her windahî poşmaniyek e. Bi demê, rojê û demsalê sond bixwe û baş bizanibe ku jiyân; peymanek e. Soz û peymanek ji bo xwe bide... **Dilan Aydın / R.2**



Helîse û rûnê nîvîşk

Diya min û meta Zerê, her tim bi hev re diketin pêş-birkê. Diya min digot; helîseya herî xweş û rind ez çêdikim. Meta Zerê jî digot; teew, ya herî xweş ez çêdikim. Dema ez helîseyê çêdikim hemû der û çinar dixwazin wek min çêkin... **Kewê Redkan / R.11**



Destpêka Romana Kurdî

Pirtûka 'Destpêka Romana Kurdî' di sala 2020'an de ji aliyê weşanxaneyê Peywendê ve hatiye weşandin. Pirtûk behsa wêjeya êwra Kavkazê û êwra di navbeyna salên 1920 û 1991'ê dike. Dema em dîro-kên ku hatine dayîn dinîhêrin... **Elif Gun / R.11**

xwebûn

1-7 ADAR 2021 HEJMAR: 63 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Jin her roj bang dikin

Jinan wekî her salê îsal jî starta çalakiyên 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê zû da. Li bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê li hemberî tundî, qetlîamên sîstematîk ên li dijî jinan û polîtîkayên tîn meşandin re, jin paş de gav navêjin û her diçe têkoşîna xwe ya rêxistinbûyî mezin dikin. Jin her roj bang dikin:

qetlîamên jinan rawestînin, meclisê ji bo rojeva qirkirina zayendî bicivînin, perpirsiyariya xwe bi cih bînin lê hikûmet guhê xwe li daxwazên jinan girtiye. Jin îsal bi dirûşma 'Em li hemberî qirkirina jinan jiyane û li hemberî tecrîdê azadiyê diparêzin' li her derê li qadan in... **Dûrket Suren / R.2**

Zanîna xwendina zimanê xwezayê

Hemû cure zanist şagirtên xwezayê ne. Bi saya xwendina zimanê xwezayê mirovahî li xwe hay bû. Teşeyên hînbûnê, bikaranîna hiş, çêkirina ezmûnan, jêgirtina encaman, ezberkirina agahiyên bi destê hostayê mezin, xwezayê diyarî me bûye. Pirtûka bêdawî ya qewî, xweza bixwe ye. Em çiqas giraniyê bidin xwendina wê pirtûkê, em ê ewqas jîr, şanaz û hişyar bin. Lê gelo mirovahiyê ev firsenda payebilind, mîrateya bêdawî û pîroz çawa dîtiye û bi çi tehrî bi kar aniyê? Wexta destpêkê, destpêka lixwehaybûna hebûnê ya mirovahiyê, bi xwendina zimanê xwezayê bişkiwî û zîl da. Bi rê û resmên xwezayê rê û dirbên meşa şaristaniya me vebû. Tiştên herî zelal û xav; av û çêre ne... **Ehmed Pelda / R.7**



Tirkîye û hêza nukleerî

Pêvajoyên jeopolîtîk bi cewherî pir dişibin zagonên xwezayê. Ew di dîrokê de hinek bi rola kesane ve jî girêdayî ne. Tirkîye her çiqas hewl bide, xwe ji xwedibûna çekên nukleerî dûr bixe jî, ew ê (pêvajoyê qanûn) bi her awayî wê neçar bikin ku wan bi destê xwe bixe. Bi hişkî ve, "klûba atomê" ne amûrek hêza gerdûnî ye. Encamên bikaranîna wê ji bo yê ku ew sepaniyê jî neyînî ye, heke ew bi ser bikeve jî. Çekên nukleerî amûrên şiyarbûnê ne, cureya karta paşîn in ku wiha tê gotin, "wê demê em bi hev re bimirin". Ji ber wê yekê, ji DYA, Rûsya, Çîn, Koreya Bakur re hewce ne... **Kurdistan Lezgiyeva / R.8**

Teoriya sîmulasyonê

Teoriya sîmulasyonê ew teorî ye ku dibêje em di sîmulasyonê de dijîn û hemû tiştên li derdora me, em jî tê de, xewn û xeyalên me, diya me, gundê me, pişkulên pezan, dinyaya me, eşyayên tê de, heta gerdûn bixwe jî ne rast in. Hemû sîmulekirî ne. Yanî sexte ne û bi kompîtîrekê hatine çêkirin. Her tiştê ku em dibînin, dixwin, bêhn dikin, temas dikin, guhdarî dikin, ji bilî çend kodên kompîtîrê wêdetir ne tu tişt in. Ango di pratîkê da em tune ne, bes hişê me heye. Ev teoriya ku li ber guhê me heya bêjî fantastîk û surreal e, xwedan argumanên xurt ên zanistî ye. Pêşveçûnên teknolojîk heya niha... **Bilal Ata Aktaş / R.8**



Ji bo zimanê xwe tu jî piştgiriye bide

Di 21'ê Sibata Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê de, bi mebesta zimanê kurdî bibe zimanê fermî kampanyaya îmzeyan hat destpêkirin. Bi hezaran kesane piştgirî da kampanyayê û kampanya berdewam dike. Endama sekreteryaya Tora Ziman û Çanda Kurdî Zûhal Tekîner diyar kir ku weke Tora Ziman û Çanda Kurdî ku 300 nûnerên komeleyan, nivîskar, zimanzan tê de cih digirin... **R.3**

CEMIYETA ROJNAMEVANAN

MEHMET SEYİTALIOĞLU

Xelata yekemîn... **R.6**

Roja Ziwanê Dayike... **R.9**

'Hesta Yekbûyî'

"Sînestezî", peyveke yewnanî ye û tê wateya "Hesta Yekbûyî". Kesên sînestezîk dema hestekê dijîn, xwe-bixwe hestekê dîtîr jî hest dikin. Mirovên sînestezîk, mirovan ne weke mirov lê bi awayê dîtbarî û bihîstyarî û nivîstyarî weke bûjen ango hêmanekê bi bîr tînin û tê digihîjin. Ew bûjenekê bi pirhêlî dibînin û hest dikin, asta hişê wan bilind e û carna nikarin hesabên biçûk ên matematîkê jî bikin; hinekî xusûsiyetên wan dişibin ên mirovên dîsleksiyê... **Yaqob Tilermenî / R.5**



Antîgonî mînaka jinên wêrek e

Çîroka jinên berxwedêr a bi navê Antîgonî êdî bi kurdî ye. Der barê wergera Antîgoniyê de me bi wergêrê pirtûkê Tahîrxan Giravî hevpeyvîn kir. Giravî got ku Antîgonî wek jineke... **Hevpeyvîna Bêrivan Kayî / R.4**

Dîrok û çîroka navê Amedê

Di meseleya navê "Amed" û "Amîd/Amîda"yê de, tiştêkî wisa anîne serê me kurdan ku em êdî wisa difikirin û wisa bawer dikin, em bûne dizên sola xwe! Bi rastî jî navê bajêr ê kevn "Amîd" û "Amîda" bûye û van çend salên dawiyê kurdan navê "Amed"ê lê kiriye? Bêguman na. Lê çima gava em kurd dibêjin "Ame(?)d" em devê xwe wisa xwar dikin ku xelk fêhmî ne ka me gotiye "Amed"

yan "Amîd"? Bersiv her çî be jî sedem hinekî tirs e... tirs jî li ser wê axê para bêkes û bêxwedanan e. Dibêjin birûsk li nav komeke mirovan bixe, ew ê jî xwe re yê bêkes û sêwî hilbijêre. Ma ne ji ber ku kurd "sêwî" bûn navê dewleta Merwanî di qeydiyên serdestan de "Merwanlogullari" bû û heman qeydî îdia dikin, "Tirk ji dema Naram Sîn ve li Amedê bi cî bûne... **Amed Çeko Jiyan / R.12**

Bi edebîyatî tewr rind kerdişê welatêk

Îmaj û îmgêyê parzemînê Afrîqaya ke mi de virazîyayo: Seka heme cayê Afrîqa rîpraşt û dumduz; çol o, wişk û wehd o, demserrê zî tim hamnan o, hertim germ o, aw çîn a, tim weyra de xela esta, ha vêşanî ver mirine, însan bêkeyf û neşad î, hetê teknolojî û endustrî, mod-ernîte ra apey mendeyî; seka no dî-yardeyî qe weyra de çîn î, qabile û eşîrê prîmîtitî, bi îfadeyo ziwanê kuçeyan barbar, yamyamî, wehş û hov î; goştê yewbînan wenî, kultur û edetê înan ecip estî, nêweşî û janî zaf î û tarûmakerdiş û dizdeya kolonyalîzama sey dewleta Almanya, Franss, Înglîstan... **Welat Raminazad / R.9**

Jin her roj bang dikin



Dûrket Suren

Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li hemberî tundî, qetlîamên sistematîk ên li dijî jinan û polîtîkayên tîn meşandin re jin paş de gav navêjîn û her diçe têkoşîna xwe ya rêxistinbûyî mezin dikin.

Li gorî rapora Platforma Em ê Cîna-yetên Jinan Rawestînin li Tirkiyeyê di sala 2020'an de 300 jin hatin qetilkirin û 171 jin jî bi awayekî bi guman jiyana xwe ji dest dan. Belkî îstatîstîkên çend jin rastî tundiya fizîkî yan jî zayendî hatine, çend jin hatine kuştin rasterast mirov nikare tespît bike, lê daneyên li pêşberî me bixwe jî rastiya qirkirina jinan nîşan didin.

Di ser sala îsal re du meh derbas bûn û jin hê jî tî kuştin, hê jî rastî tundiye tîn, hê jî daneyên derdikevin holê tirsna in û hê jî kujer tîn parastin.

Jixwe mijara parastina fail û kujerên jinan, polîtîkaya hikûmetê ya dijminatîyê li jinan dike êdî venaşêre. Heger jinek dema tê qetilkirin bi polîtîkayên bêcezakirinê re rû bi rû bimînin, dewlet li şûna ku bi zagonan mafê jiyana jinan biparêze kujerên wan biparêze û ev jî bibe sedema qetlîamên sistematîk, wê demê kes nikare bibêje li vî welaatî qirkirina zayendî tune ye. Li vî welaatî li ser jinan qirkirina zayendî heye û ev qirkirin bi destê hikûmeta AKP-MHP'ê ve tê bipêxistin. Yekser an neyekser!

Di 19 salên desthilatiya AKP'ê de, ji bo jinan ji xeynî hê bêtir şer, xizanî, kuştin, tundî û tecawizê tu polîtîkayên erênî berbiçav nayê dîtin. Di danezana hilbijartinê ya 2002'yan a AKP'ê de, "Di têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan me rêgeza sifir tolerans esas girt" derbas dibû, lê daneyên tîn parvekirin berovajî vî yekê nîşan didin. Li gorî hin raporên di 17 salan de mafê jiyana 15 hezar jinan hatiye bîpêkirin. Li gorî raporên Bîanet û KCDP'ê jî di 19 salan de herî kêr 7 hezar û 455 jin jî hêla zilaman ve hatine qetilkirin. Jin belesebeb nabêjin daneyên kuştinê jinan jî encama şerêkî zêdetir in! Jixwe di 19 salan de AKP ji çî re "sifir tolerans" esas girt, ew bû sedema encamên êdî nayên hesabandin!

Piştî ku Peymana Stenbolê ji bo were betalkirin li nîqaşê hat vekirin, ji her qadê jin û rêxistinên jinan belkî jî cara yekemîn li hemû Kurdistan û Tirki-



yeyê ewqas bi hev girtî tevgeriya û bûn çeper li dora peymanê. Desthilata AKP-MHP'ê li şûna ku Peymana Stenbolê ya bi madeyên xwe pêşiya her cure tundî û qetlîaman digire bixe meriyetê, hewl dide betal bike. Tundî û kuştin hatiye asta qirkirinê, lê ji rayedarên hikûmetê ji xeynî gotinê "jin bûyeran mezin dikin" dengê dernayê. Belkî jî bi vî yekê dixwazin hêdî hêdî bingeha betalkirina Peymana Stenbolê amade bikin.

Jin her roj bang dikin: qetlîamên jinan rawestînin, meclisê jî bo rojeva qirkirina zayendî bicivînin, perpirsiyariya xwe bi cih binin lê hikûmet guhê xwe ji daxwazên jinan re girtiye. Ji bo rawestandina qetlîamên jinan ne polîtîkayekê dimeşîne, ne jî dihêle mijara qetlîamên jinan were rojeva meclisê. HDP'ê li ser rojeva qirkirina jinan li civata giştî ya meclisê civînek xwest. Ne rasthatin e ku bi dengên AKP-MHP'ê hat redkirin. Banga CHP'ê ya guhê bidin dengê jinan jî dîsa ji hêla AKP-MHP'ê ve hat redkirin.

Mijara qirkirina zayendî ya ku ewqas di rojeva jinan de ye û ji her aliyê civakê banga qetlîamên jinan rawestînin, şertên Peymana Stenbolê bi cih binin tîn kirin, desthilatdariya ku welêt bi rê ve dibe çawa ewqas dikare li hemberî kuştinê jinan bîdeng bimîne, mirov matmayî dihêle. Êdî hatiye wê astê ku zilam bê minet li ser torên medyaya civakî gefên kuştinê li jinan dixwin, wextî her roj 3 jin tîn qetilkirin,

lê hikûmet bi israr dixwaze çav û guhê xwe li vî yekê bigire.

Ger Peymana Stenbolê were pêkanîn, wê demê kujerên bi qirewat nikarin ewqas bi hêsanî ji darazê safî bibin. Ger Peymana Stenbolê were pêkanîn, wê demê tecawizkarê zarokan li ber deriyê dewletê nikarin bi def û zirneyan werin pêşwazîkirin. Ger Peymana Stenbolê were pêkanîn çawişên weke Musa Orhan (di vir de polîtîkayek taybet a li dijî kurdan jî heye) nikarin xwe bispêrin endamtiya xwe ya dewletê!

Heta niha bi têkoşîna jinan Peymana Stenbolê neyê bicihanîn jî betal nebûye. Lê desthilatdariyê wisa kiriye ku bi gavên xwe yê diavêje tu dibêjî qey tola berxwedana jinan a Peymana Stenbolê distîne. Li ser ewqas tundî û qetlîaman hesabê çawa hê bêtir bikaribin jinan asê bikin tê kirin. Weke mînak dikarin 'Zanîngeha Jinan' bidim. Projeya afirandina "jina maqul" a bi rêya Zanîngeha Jinan ku dixwazin bixin meriyetê, hem de jinan ji civakê qut bike hem jî newekhevîyê kûrtir bike. Bila ew heta sibê bi rêya "çapemeniya xwe" bibêjin ji bo jinan em gaweke mezin diavêjin. Hikûmetê kî dixapîne? Baş tê dizanîn ku Zanîngeha Jinan a ku tê xwestin pêşî li Hatayê bixin meriyetê tenê de dijminatîya jinan ava bike.

Li dijî daxwazên jinan ên zanîngehên demokratîk, xweser, azad û wekhev ev proje jî bo hikûmetê gaweke mezin a

pergala wan a perwerdeya zayendparêz e. Dixwazin bi vî yekê jiyana jinan hê bêtir bixin bin kontrola xwe. Bûyerên tundiya zilaman ên li zanîngehan pêk tînin jî de berpirsiyarê bispêrin jinan û tacîz û tecawizê rewşa bikin.

Tê dîtin ku jin bi her awayî bi polîtîka û zagonên mêr-dewletê ve, di çembera faşîzmê de hatine dorpeçkirin. Lê bila ev neyê jibîrkirin ku jin çawa li dijî betalkirina Peymana Stenbolê derketin, çawa li dijî projeya otobosên pembe yê li şûna tacîzkar, jinan tecrîd dike derketin, li dijî zanîngehên jinan û sepandinên dijminatîya jinan dikin jî derkevin.

Jin hê bi hêztir û polîtîk nêzî meseleyan dibin. Dê bi têkoşîna hev girtî qirkirina zayendî rawestînin. Dê destûrê nedin li ser jinan hesabên xwe yê qirêj pêk binin.

Li Kurdistanê jî li Tirkiyeyê jî tevgera jinan dê bi têkoşîna xwe bi AKP'ê paş de gav bide avêtin. Ew her êrîş bikin, jin hê bêtir li qadan û li hemû deveran tevî xwe yê têkoşînê û berxwedanê mezin bikin. Bila ev baş bê zanî ku ger qetlîamên jinan polîtîk in, gotin û tevgerên jinan jî polîtîk in!

Dê jin îsal jî di 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê de, bi pêşengiya Teygera Jinên Azad (TJA) bi dirûşma 'Em li hemberî qirkirina jinan jiyane û li hemberî tecrîdê azadiyê diparêzin' li her derê dakewin qadan û li dijî zihniyeta ku dixwaze wan tîkê bibe dengê xwe bilind bikin.



Dilan Aydın

Nesekine...

"Li benda hatina tu demsalê nemîne! /Nebêje qey; bi guherîn û derbasbûna wan re/jiyana me ya ku /wekî 'mehkûmiyete' derbas dibe jî dê biguhere/Nebêje qey ahenga jiyana me/wekî ya wan bi rêkûpêk e/Nesekine li benda tu demsalê!/Nebêje qey dîtin û gihîştin wekî ya wan e!/Tu tişt ne wekî dîmenên salê ye/xweser, azad û xwezayî.../Dûr e ji me aheng/dûr e ji me pêkhatinê jixweber/ên wekî yê demsalan/Xwe nexapîne ey hêviya ku tu carî dawî lê nayê!/Xwe jî û me jî/yan jî xwexapandinê azad bike/yan jî rastiya heyî li rûyê me bibêje!/Ev qonaxa dawî ye êdî!/Lew ruh jî beden jî heta cihekî dikarin debar bikin.../Xwe jî me jî jî vî bendewariya malkambax derbas bike/Da ku em êdî nebêjin/vê carê jî wiha derbas bûn ev dem û demsal.../Da ku rewîtiya me ya ber bi bêriyan ve bi gihîştinê bi dawî bibe."

Em û demên salê ji gelek waran ve wekî hev in. Dema em baş li wan binêrin dê têkiliya me ya bi wan re diyar bibe û em ê bibînin ku em çiqas ji hev in. Ruh û fizîka me jî wekî demsalan e. Carna geş, hêşîn û rengîn dibe, carna jî hişk, sar, zuha û bê reng dibe... Demên salê yê bi dîmenên cuda, li pêş çavên me diguherin, vediguherin û digihîjin kemala xwe; mînakên jiyane yê herî rast in ji bo me. Dîmenên zindî yê bi roj, hefte û mehan diguherin, ji bo me dibin tesbîten jiyane. Bi wan re em xwe dibînin, keşif dikin û mijarên ku di serê me de ne bi wan xuya dibin.

Gotinên; "Bibînin" "bibihîsin" "bifikirin" jî bo jiyane gotinên esasî ne. Şiyarî, nûbûn û pêşveçûn bi wan pêkan dibe ku ev nebin em ê çî bin û çawa bijîn? Ev gotinên ku em hem jî xwe re, hem jî ji hev re dibêjin; ji bo me rewîtiya jiyane ya ku me ber bi pêş ve dibe nîşan didin. Dema ku em nenihêrin em ê nikaribin bibînin, baş guhdarî nekin em ê nîvên bibihîsin û dema em nefikirin dê hiş û dilê me bixitîme, şêlû bibe, neçareserî wekî siya me bi me re be û zelalî tu carî çênebe.

Di vî demsalê de ku roj ber bi biharê ve diçin, em careke din bi 'xwe ya heyî' re rû bi rû ne! Pirsên; min ev demsal û sal çawa derbas kirin, çî guherand û çî guherî dê werin hişê me. Em ê li gorî bersivên van pirsan, xwe baş an jî nebaş his bikin, erênî yan jî neyînî nêzî xwe bibin.

Roj derbas dibin... Dem û demsal wekî avê diherikin. Wisa zû diguhere her tişt û jiyane vediguhere henekek! Her tiştê ku tu dibêjî nabe, bi carekê pêk tê û tu li naverasta jiyane xwe bê parastin dibînî. Tiştê ku nebe namîne êdî di jiyana te de... Bi demê re, bi rojên 'ji hev' ên bêaheng û efsûn, mane re dimînî û tenê ji bo ku divê bijî, li ser piyan bî, hewl didî. Her sibeh û her êvar bi dîmenên nas re rû bi rû dimînî û hêviyên ku wekî teseliyê ne, ji demê, ji sibe û êvarê dikî.

Nesekine li benda tu demsalê! Lewre her bendewarî windahiyeke di van rojên malkambax de... Her windahî poşmaniyeke e. Bi demê, rojê û demsalê sond bixwe û baş bizanibe ku jiyane; peymanek e. Soz û peymanek jî bo xwe bide... Ji bo ku tu 'heyfa xwe' li tu dem û demsalan neynî, mirin nebe cihê heyf û mixabîniyê û veneguhere xewnerêşkê jî bo te.

Serpêhatiyên jinan li ser dîwaran xêz dike

Li Yemenê jina bi navê Heyfai Sibî, ramanên xwe bi xêzkirina wêneyan a li ser dîwaran tîne ziman. Wê heta niha gelek kampanya li dar xistine û beşdarî çalakiyên navneteweyî bûye.

Sibî li ser dîwaran, tiştên tîn serê jinan xêz dike û bi vî awayî dibê dengê jinan.

Der barê xêzkirina wêneyên li ser dîwaran de, Sibî diyar kir ku ew dixwaze bi rêya dîwar, xwe û pirsgirêkên ku jin di nav civakê dijîn û êşên dikîşînin bîne ziman, nameza jî êşên jinên di nav şer de.

Sibî destnîşan kir ku ew bi hunerê dikarin gelek peyaman bidin û wiha behsa kampanyayê xwe kir: "Ji 2012'an vir ve gelek dîwar hene lê dîwarên ku min di kampanyaya xwe ya

yekem de, Mexdûrên Bêdeng neqîşandin 13 wêne li Sanayîyê, dû re jî kampanyaya Kevoka Aştiyê jî bo Ye-

menê, kampanyeye elektronîkî bû, jî bo piştigirîya aştîyê û mirovan bû. Piştî wê, min pêşangehên şer û miro-

van li Singaporê 'Bînalaya Singaporê' di 2019'an de li dar xist û pêşangehên min 9 dîwarên li ser erdek 22 metreyî bûn. Hemû nîgarên li ser dîwaran, li ser pirsgirêkên yemeniyên bi giştî û bi taybetî di dema şer de ya jin û zarokan bû. Di van demên dawî de, min kampanyaya xwe ya nû ya bi navê 'Jin û şer' li bajarê Adenê da destpêkirin. Min dîwarê bi navê 'Em ê bi hev re bijîn' xêz kir, heke li bajarên din piştî zayîna xwe derfet hebe ez ê hewl bidim bêtir dîwaran çêbikim. Her wiha li ser dîwar em ê bi hev re bijîn, min ezmûna xwe ya jidayikbûnê xêz kir û hewl da ku xewna xwe ya pêşerojê tijî aştî, şahî û evîn nîşan bidim. Dîwar jinên duvanî ronî dike."

Çavkanî: NÛJINHA



Grevên birçîbûnê bi biryar didomin

Girtiyên siyasî yê ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê Mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya dorveger û bêdawî kirin. Çalakiya girtiyên siyasî ku koma 19'emîn dewr girtiye zêdetirî 90 roj in dewam dike. Her wiha bi

heman armanca bidawîkirina tecrîdê, li Mexmûrê zêdetirî 70 roj û li Yewnanistanê jî nêzî 60 roj in grevên birçîbûnê didomin.

Çetîn Yildiz ku li Girtîgeha Tarsûsê ya Jimara 2'yemîn a Tîpa F'yê li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ketiye greva birçîbûnê, ragihand ku heya ku daxwazên wan neyên qebûl kirin dê paş de gav navêjin.

Yildiz dema xwendekarên Zanîngeha Kirşehîrê bûye, di gulana

2017'an de bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" hatiye girtin.

Yildiz ji malbata xwe re wiha behsa bêhiqûqiyên li girtîgehê kir: "Name û kargoyên me dereng didin me. Em girtî 7-8 mehan di hucreyên karantînayê de bi tena serê xwe dimînin. Li hucreyan nivîn, balif tune ne. Li girtîgehê rojê saetekê avê berdidin. Niv saet ava germ, niv saet ava sar. Li kantînê maske û lepik tune ne."

AMED



Ji bo kurdî îmze têt komkirin

Di 21'ê Sibate Roja Zimanê Zikmakî ya Cihanê de bi mebesta zimanê kurdî bibe zimanê fermî kampanyaya îmezayan hat destpêkirin. Bi hezaran kesan piştgirî da kampanyayê û kampanya didome

Bi pêşengiya Komîsyona 21'ê Sibate ku ji Platforma Zimanê Kurdî û Tora Ziman û Çanda Kurdî pêk tê ku li ser ziman dixebitin, li oteleke navçeya Sûrê ya Amedê, di çarçoveya 21'ê Sibate Roja Zimanê Zikmakî ya Cihanê de, ji bo ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê bi civîneke çapemeniyê kampanyaya îmezayan da destpêkirin.

Hevserokên HDP û BDP'ê jî di nav de serokên giştî yê partiyên siyasî yê kurdî, rêveberên Odeya Pîşesazî û Bazirganiyê ya Amedê, Baroya Amedê, Odeya Bijîşkên Amedê û nûnerên rêxistinên civakî yê sivil û gelek zimanzan û rawêşanên kurd tev li civînê bûn.

Li Swêdê jî kampanya

Cizîrî destnîşan kir ku beriya ew kampanyayê bidin destpêkirin li Swêdê jî piştgiriyeke biwate ji bo zimanê kurdî hatiye destpêkirin û got: "Komeleya Federasyona Swêdê li cem xwe berî

me dest bi kampanyê kir. Ji partiyên cuda 20 parlamenterên swêdî, kampanyaya 'Bila zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û fermî' dane destpêkirin. Ev jî ji bo me û kampanya me destpêkek gelek baş e. Em bawer in wê ev kampanyaya me li gelek deverên din ên cihanê jî belav bibe."

Bi hezaran îmze kom kirin

Hat ragihandin ku bi awayê online heta niha zêdetirî 10 hezar îmze hatine komkirin. Endama sekreteriyaya Tora Ziman û Çanda Kurdî Zûhal Tekîner diyar kir ku weke Tora Ziman û Çanda Kurdî ku 300 nûnerên komeleyan, nivîskar, zimanzan tê de cih digirin û Platforma Zimanê Kurdî ku ji 9 partiyên siyasî pêk tê starta kampanyayê dane.

Bang li her kesî hat kirin

Tekîner destnîşan kir ku di demeke kin de heta niha bi awayê online bi hezaran îmze kom kirine û got: "Mirov bi



riya partiyên siyasî rêveberên platformê jî dikarin îmze bikin. Xebata me wê di demeke kin de bigihîje milyonan. Me ji bo ziman gaveke mezin avêt. Em bang li her kesî dikin ku li derdora kampanyaya îmezayê bibin yek."

Daxwaza hemû kurdan e

Mamosteyê MED-DER'ê Mûrat Bîlgîç jî diyar kir ku bi salan e kurdî tune tê hesibandin, li vî welatî nayê nasîn û wiha axivî: "Daxwaza hemû kurdan ya 'êdî bila zimanê kurdî bibe xwedî statuyek û bibe zi-

manê perwerdehiyê' heye. Kampanya ne tenê ya rêveberan e ya gelê kurd û hemû dostên wan e. Kî bixwaze ji bo gelê kurd û ji bo kurdî tişteke bike bila kerem bike were. Bila werin daxwaza kurdan a sedsalan em li ser ziman tacîdar bikin." AMED

Rojnameger hatin bibîranîn

Rojnameger Rohat Aktaş û endamê Meclisa Partiyê ya DBP'ê Mehmet Yavûzel li gel astengiyên li Rihayê hatin bibîranîn. Her wiha li Êlihê jî rojnameger Cengîz Altun hat bibîranîn.

Midûrê Karên Nivîsê yê Azadiya Welat Rohat Aktaş û endamê Meclisa Partiyê ya Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) Mehmet Yavûzel, dema qedexeyên derketina derve yê li navçeya Cizîrê ya Şirnexê, di "jêzeminên wehşetê" de bi şewitandinê hatibûn qetilkirin. Polîsan bîranîna ku li ser gorên wan ên li navçeya Pirsûsê ya Rihayê bihata kirin asteng kirin.

Beriyê saeta bîranînê Goristana Malbatê ya Pirsûsê ji aliyê polîsan ve

hat dorpêçkirin. Dema ku malbata Aktaş û Yavûzel, rêveberên Komeleya Rojnamegerên Dicle û Firatê (DFG) û HDP'î hatin goristanê, polîsan ew asteng kirin û bi hinceta qedexeya walîtiya Rihayê destûr neda ku derbasî goristanê bibin.

Parlamentera HDP'ê ya Rihayê Ayşe Surucu, bertek nîşanî dorpêça polîsan da û ev tişt got: "Li vir sûc tê kirin. Li tu dera dinyayê pêkanîneke bi vî rengî nîne. Destûr nadin ku em serdana goristana wan kesan bikin ku li jêzeminan bi awayekî hovane hatin qetilkirin, bikin. Piştî nîqaşa hat kirin polîsan got ku wê tenê destûr bidin Surucu û dayika Aktaş Meliha Aktaş. Meliha



Aktaş, li dijî vî derket û diyar ku bi wê bi tena serê xwe neçe ser gora kurê xwe û ev tişt got: "Ez bi tena serê xwe nikarim vî êşê hilbigirim. Bila ev jî bibe şerma kesên em asteng kirin."

Ji ber astengkirina polîsan li ber goristanê daxuyaniyê dan. Rêveberê DFG'ê Zeynel Bülüt jî axaftinek kir û ev tişt got: "Dibe ku îro destûr nedin lê 50 sal derbas bibe jî em ê vî têkoşinê bişopînin. Em hevalên xwe bi bîr tînin û diyar dikin ku em têkoşîna wan bişopînin."

Pênûs li erdê nema

Nûçegihanê rojnameyê Yenî Ozgur Ulkeyê Cengîz Altun ku di 24'ê sibata 1992'an de li Êlihê hatibû qetilkirin, li ser gora xwe ya li taxa Çamlicayê hat bibîranîn. Piştî ku qurnefîl danîn ser gora Altun dayika wî Turkan Altun axivî û diyar kir ku pênûsa kurê wê li erdê nemaye û wiha got: "Îro bi hezaran kesên ku pênûsa kurê min bigirin hene. Di vî rêyê de ku kurê min canê xwe ji bo wê da, îro bi hezaran hempişeyên wî dimeşin. Kurê min, ên di rêya te de dimeşin, weke te karê xwe didomînin." Serokê DFG'ê Serdar Altan jî destnîşan kir ku Cengîz Altun yek ji wan kesan bûye ku di salên 1990'î de ji bo ragihandina dengê gelê kurd rojnamegerî kirine. **RIHA - ÊLİH**

Li girtîgehan mirinên biguman

Navenda Nûçeyan

Li girtîgehan zext û zordarî dewam dikin. Hat îdiakirin ku li Girtîgeha Tîpa T ya Wanê girtiyê bi navê Kemal Akbaşî (55) xwe kuştîye. Her wiha hat îdiakirin ku li Stenbolê zarokê 17 salî Kadîr Akdar ku girtîbû xwe kuştîye. Malbata Akbaşî got ku ew bawer nakin Kemal Akbaşî xwe kuştîye û mirina wî biguman e.

Girtî Kemal Akbaşî (55) ku hat angaştkirin di 22'yê sibate de li Girtîgeha Tîpa F a Wanê întihar kiriye, li Nexweşxaneyê Dûrsûn Odabaşî ya Wanê jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Akbaşî, piştî bidawîbûna karên otopsiyê li gundê Panemêrgê navçeya Seravê ya Wanê hat veşartin. Hat ragihandin ku Akbaşî li girtîgehê rastî zextan hatiye û gelek caran xwestine bibe îtîrafkar. Balkêş e ku roja Akbaşî întihar

kiriye ji aliyê dadgehê ve biryara be- raetê hat dayîn.

Zarokê 17 salî Kadîr Aktar li Navçeya Bagcilarê ya Stenbolê di 16 sibate de tahlîye bû. 2 roj bi şûn de polîsan dîsa ew bi îşkenceyê binçav kir û şandin dadgehê. Aktar ji dosyeyek din dîsa hat girtin. 2 roj bi şûn de rayedarên girtîgehê îdia kirin ku Aktar li qawîşê darvekirî hatiye dîtin.



DI BERHEMAN DE SADEBÛN Û ZELALBÛN PÊWÎST E Antîgonî mînaka jinên kurd ên wêrek e

■ Bêrivan Kayi

Ka em hinekî bifikirin, dema Aphrodîte, Hera, Zeus an jî Athenayê bi kurdî biaxivin an jî rêwîtiya Odysseus a 20 salan û hêviyên Penelopeyê yên ku di rîsê destê wê de ta bi ta diho-nand, bi kurdî werin nivîsin? Bi rastî fikra vê yekê jî mirov dilxweş dike û bişîrînekê bi xwe re tîne. Çiroka jina berxwedêr ya bi navê Antîgonî êdî bi kurdî ye. Der barê wergera Antîgoniyê de me ev hevpeyvîn bi wergerê pirtûkê Tahirxan Giravî re kir.

Ji nav klasîkên yewnanan te berê xwe daye Sofoklîs û pirtûka wî ya bi navê Antîgonî. Çima Antîgonî?

Berî ku bersivên pirsên we bidim, gelek spas ji bo vê eleqeya we ya germ ku we nîşanî wergerê daye. Ji klasîkên yewnanî wergera min a pêşîn ne Antîgonî ye. Ya pêşîn tragedya Esxîlos a bi navê "Promîtheus Desmotîs", ango Promîtheusê Girêdayî yan jî Qey-dankirî ye. Min ev tragedya bi navê "Promîtheusê Zincîrkirî" wergerand kurdiya kurmançî û di nîsana 2009'an de jî ji aliyê weşanxaneyê Dozê ve hat çapkirin. Min ev îthafê "Dizên Agirê Azadiyê" kiriye. Antîgonî ya duyem e ku werdigerînim. Armanca min a destpêkê ew bû ku berhemên her sê hozanên tragedya û dramayê Esxîlos, Sofoklîs û Eurîpîdîs li gor rêza temenê wan, rêz bikim. Her çend di eynî serdemê de jiyabin jî wek temen Esxîlos jî Sofoklîs û Sofoklîs jî jî Eurîpîdîs mezintir e. Hêvîdar im ku rojekê bikaribim hemû berhemên wan her sê hozanên mezin wergerînim kurdiya kurmançî.

2 hezar 500 sal beriya niha, Sofoklîs bi rêya Antîgoniyê ji me re dibêje ku ji bo rêxistina (organîzekirina) civakeke bajarî (polis-dewlet) her çend pergaleke bi qanûnan (nomos-an) honandî pêwîst be jî, divê bingeha xwe bispêre qanûnên xwedayî yên qedîm (thesmos-an) û edet û toreyan. Nabe mirovek, ango desthilatdarek bi kêfa dilê xwe qanûnan daye û divê bîr û bawerî û hesasiyeten civakê bide ber çavên xwe. Ji ber vê Aristotelîs exlaq û polîtîkayê (sinc û siyasatê) jî hev cuda nabîne û nake. Dîroka felsefeyî ya hiqûq û polîtîkayê, çavkaniya rewatiya (meşrûtiya) nomosê (yasayê) divê çî be, hê jî bi vê pîrsa qedîm ve mijûl dibe û gengeşî dike. Zanîsta dadî jî bingeha xwe dispêre bîr û bawerî, edet û torên civakî, ango xwezaya mirovî bi xwe.

Bi kurtasî, Sofoklîs dibêje ku qanûnên ji aliyê mirovan ve hatine çêkirin divê digel ên xwedayî di nav

ahengekê de bin. Qanûnên dewletê li gor kesan an jî desthilatdaran tîn guhertin lê yên xwedayan û edet û toreyî qedîm in û zû bi zû nayên guhertin. Gava mirov qanûnan çêdikin divê himê wan bispêrin tişteki rewê û exlaqî.

Pirtûk bi hevokên 'ji Dayikên Şemiyê û miriyên bêkêl û gor re' dest pê dike. Têkiliya di navbera Antîgonî û Dayikên Şemiyê de çi ye?

Antîgonî wek jineke, wek miroveke xwezayî û xwedî wijdan, tawanê birayê wê her çî dibe bila bibe, dixwaze termê wî yê bêruh were veşartin. Nikare vê hizrê bike, dibe ku naxwaze vê hizrê bike ji bo çî tişteke ku ji aliyê xwedayan ve bi olî, toreyî û exlaqî rewê ye pêk neyê. Ji bo vê jî li hemberî qanûnên dewletê (nomos-polîs) derdikeve xwe dispêre qanûnên xwedayî (thesmos-an). Ev yek hem di diyalogên navbera her du xwişkan- Antîgonî û Îsmînî- de û hem jî di diyalogên navbera-Antîgonî û Kreon- de derdikeve pêşberî me. Gengeşiyêke, lihevixistineke beramberî ya ehlaqî/sincî û siyasî ye. Antîgonî li hember qanûnên dewletê, azadî û mafên takekesiyê derdixîne pêş. Ez dixwazim ji vir û pê ve vê şîrovevê jî raya xwîneran re bihêlim.

Antîgonî her çend ji bo rêxistinên civakên nûjen (bêîteatiya sivil, femînîzîm û hwd.) mînakeke bêhempa be jî, ji bo min mînaka jinên kurd ên wêrek, xwedî wijdan, dilovan û têkoşer e ku di civakeke bindest de dijîn. Hem li hember nexweşiyên civaka xwe û hem jî ji ber zilma zordarên welatê xwe tédikoşe. Dayikên Şemiyê jî 15 salên wekî Antîgoniyê tûşî her cure zilm û tehdeyê dibin ji bo ku tişteki xwezayî û ehlaqî pêk bînin. Lê mixabin li hemberî wan hêzeke bêehlaq û hov heye. Ez bawer dikim hewce nake êdî gotinê dirêj bikim ku ji bo çî min ev werger îthafê Dayikên Şemiyê kiriye.

Dema te wergera Antîgoniyê kir çî zahmetî derketin pêşiya te, hem zimanî hem jî bi giştî?

Di her berhemêke wêjeyî de, her tim zor û zehmetî hene. Xasma ev berhem jî 2 hezar 500 sal beriya niha hatibe nivîsandin, helbet zehmetiyên wê zêdetir dibin. Lê gava mirov ji tişteki hez bike, ev zehmetî li ber çavên mirov nayên. Dema ku berhem diqede û digehê ber destê xwîneran jî hingê hemû zor û zehmetiyên te kêşandî tu jî bîr dikî.

Ji bo min zor û zehmetî nebûna demê ye. Lewra ji bo ku ez aborandîna xwe bikim, divê ez hefteyê pênc rojan bixebitim. Ez ancax rojê 3 an 4 saetan dikarim ji bo xwendin û

Sofoklîs dibêje ku qanûnên ji aliyê mirovan ve hatine çêkirin divê digel yên xwedayî di nav ahengekê de bin. Qanûnên dewletê li gor kesan an jî desthilatdaran tîn guhertin lê yên xwedayan û edet û toreyî qedîm in û zû bi zû nayên guhertin

wergerê veqetînim. Bi kurtasî ez ne wek kar lê wek hobî bi wergerê mijûl dibim.


Zimanê wergera Antîgoniyê zimanekî zelal û sade ye. Mirov dibêje qey Antîgonî, Îsmene Kreon her yek jî wan kurd e û bi kurdiyêke zelal di-axivin. Bi te sade û zelalbûn ji bo wergerê girîng e yan na?

Gelek kêfxweş bûm ku werger li xweşa we çûye. Helbet di her berhemê de, çî berhem dibe bila bibe sadebûn û zelalbûn pêwîst e. Ji ber ku ev têngîştina mijarê hêsantir û xweştir dikin. Divê metafor, argo, biwêj û têngîştin civakeke biyanî li gor yên civaka xwe baş li hev bînin. Zimanekî helbestî, kevin û zehmet hindî ji min hat, min wergerand ser kurmançiyêke sade û hêsan da ku her kes bikaribe têngîştî. Ez kêfxweş bûm ku li gor dilê we bûye.

Te wergera klasîk a bi navê 'Promîtheusê Zincîrkirî' ya Esxîlosî yewnanî jî kiriye. Têkiliyêke çawa di navbera karakterên her du hozanên tragediyê û dramayê Esxîlos û Sofoklîsî de heye?

Ev babet analîzeke/hûrgiliyêke kûr û dûr dixwaze. Ji bo vê jî ez bi kurtasî bibêjim: Lehengên Esxîlosî bi giştî kesên xwedî zerengiyê sermîrovî ne (kesên tîtanas, mirovên dêw û nîxweda ne). Promîteus li hember desthilatdariya xwedayan ku dixwazin neslê mirovahiyê ji kokê ve biqelînin/tune bikin, mirovahiyê diparêze. Ango xweda agirê ku dabûn mirovan car din ji wan distînin/digirin. Ji ber ku Esxîlos, agirî wekî bingeha jiyana û destpêka şaristaniyê pênase dike (ihtimaleke mezin e ku ev hêmana agirî jî mîtolojiya kurdan û ya gelên rojhilata navîn hatiye girtin, wekî Kawa). Mirovahiya ku bê agirî maye ew dê nikaribe jiyana xwe bidomîne. Ji bo vê jî Promîteus agirî ji xwedayan didize û dide mirovan û mirovahiyê rizgar dike. Ji ber vê kir-yara wî jî xweda wî ceza dikin û bo heta hetayê wî li ser şaxekî çiyayê Qafqasê zincîr dikin.

Lehengên Sofoklîsî, kesên ji nav mirovên rojane ne ku hatine îdealîzekirin. Kesên ji mirovên navekî (wasat) wêrekî in û bêyî alikariya mirovekî din tédikoşin û di nav tenêbûna xwe de gernasî û vîna xwe didin qebûlîkirin. Ango ne tîtanas, ne mirovên dêw û ne jî nîxweda ne,



mîrov in. Lê wekî lehengên Esxîlosî, ew jî xwedî biryareke pola, têkoşer û heqxwaz in û cezayên wan her çî dibe bila bibe tişta ku pê bawer in xwe jê paş ve venakişînin.

Bi kurtasî Promîteus jî û Antîgonî jî li dijî zordarî û neheqiyê bi dis-ekin.

Feydeya wergerê çî ye û de-riyekî çawa li çand, huner û wêjeya kurdî vedin?

Her zimanek dinyayek e. Wergerê ve firsendê dide me ji bilî ferheng, çand û kelepûra me, em ya gelên din jî nas bikin. Ev jî bîr û bawerî, raman û hizir, xewn û xeyalên me berfirehtir dike. Tenê di zimanê xwe de nivîsandin wêjeya asta neteweyî ye lê wergerê wêjeyê digehîne asta cîhanî. Werger her çend bi qelîte û zehf be ew ê nivîskarên zimanê kurdî berhemên hê baştir binivîsînin. Werger di her warî de zimanî bi hêz dike.

Wek tê zanîn ku her diçe qada wergerê ya kurdî jî berfireh dibe. Li gor te, wergerên hatine kirin çawa nin?

Belê, rast e wekî di gelek qadên kurdewarî de, di qada wergerê de jî pêşketineke berbiçav heye. Ev yek jî cihê şahnazîyê ye. Ger ku di serdema Bedirxaniyan û ekola Hawarê de ev kar bihata berdewamkirin û her sal tenê 3-4 kitêb bihatana wergerandin, qada wergerê jî ya îroyîn dê berfirehtir û dewlemendtir bûya. Lê dîsa jî asta ku em gihîştinê ne xirab e. Hêviya pêşketin û geşbûneke mezintir dide.

Li gor min wergerên xirab tune ne û tenê wergerên qels û yên baş hene. Çî qels û çî baş her wergerek ji bo zimanekî qedexekirî destkeftin e. Her çend gelek werger û nivîsên di despêkê de qels bûn jî -lê ne hemû-, derfeteke mezin dane me ku em bigihîjin asta îroyîn û em bikaribin hêdî hêdî ber bi zimanekî/kurmançiyêke standart ve biçin. Em hemû baş dizanin ku zimanê me ne zimakekî fermî ye dewletekê ye û ne jî yê perwerdehiyê ye. Ji bo vê jî nivîskar û hezkerên zimanê kurdî xebatên xwe dilsozane û fedakarane kirine û dikin. Şoreş bê ked û zehmet nabe. Asta ku em îro gihîştinê, asteke baş e û wisa hêvî dikim ku di pêşerojêke nêzik de jî dê hê baştir û geştir bibe.

Ji bo pêşerojê wergera klasîkên wek Îlyada, Odysseusê jî difikirî gelo?


Belê. Ev projeyek e ku ez hê li Zanîngeha Zanîstên Aborî ya Athî-nayê xwendekar bûm difikirim. Fikra min ev bû ku despêkê berhemên theatroya klasîk ên her sê hozanên mezin: Esxîlos, Sofoklîs û Eurîpîdîs wergerînim û paşê jî yên dîroknivîs û filozofan (wek Îrododot/Herodot, Ksenofondos, Aristotelîs, Platon û hwd.) wergerînim. Lê ev hemû bi demê û taqetê ve girêdayî ne. Bi qasî ku taqet û tenduristiya min destûr bidin ez ê vî karî berdewam bikim. Niha niyeta min ew e ku pirtûka dîrokî ya Ksenofondos a bi navê "Kîrou Anavasî" ango "Wergera Dehhezaran", wergerînim kurdî. Hêvîdar im rojekê dor were ser Îlyada û Odîseusê jî.



Tahirxan Giravî kî ye?

Adara sala 1973'yan li gundê Ertelanê yê nêzikê peravên gola Wanê ye hatiye dinyayê. Dibistana seretayî li gund, a navîn û lîseyê jî bi dawî kiriye. Li Zanîngeha Neteweyîyî û Kapodîstrîako ya Athînayê Beşa Zanistiyên Aborî (Ilmên Iktîsadî) xwendiyê. Di serdema dehsalên 80'yî û 90'yî de bi kurdî nivîsiye û werger kiriye. Zanîngehê dest bi karê wergerê kiriye. Pirtûka "Promîteusê Zincîrkirî" dema xwendekariya xwe wergerandiyê.

'Hesta Yekbûyî' ya Vladimir Nabokovî



KitêbXaneyaya CAB
Yaqob Tilermenî

Min herî dawî romana bi navê *Îhtîşam* (Podvig/Glory) a nivîskarê rûs, Vladimir Nabokov xwend û pê re romanên wî *Lolîta* û *Jiyana Rasteqîn a Sebastian Knight* ji nû ve hatin bira min ku di wexta xwe de bandoreke erênî li min kiribûn. Her wiha *Îşaret û Sembol*, *Maşenka*, *Çav*, *Agirê Tefiyayî*...

Romana bi wergera zimanê tirkî *Îhtîşam* ku cara pêşîn bi navê *Romantîçeskîy* (serdema romantîk) li Berlînê di gulana sala 1930'yî de, nivîsandina wê bi zimanê rûsî hatibû destpêkirin û di dawîya salê de temam bûbû, bi navê *Podvig* di sala 1932'yan de hatibû weşandin. Di romanê de lehengê ciwan ê li sirgûnê ku di nav tenêtiyekê de vedigeveze, bi serhatiyên re rû bi rû dimîne ku ew kîtekîten destnîşankirî bêwate dixuyên û di tevgerên herî biçûk de jî xwedî ferasetêke keleşanî ye. Digel ku lehengê romanê Martin û Sonya hinekî bişîbin Vladimir Nabokov û hevîna wî Vera Nabokov jî, bi gotina nivîskêr, Martin dişibe kurê merivekî ne nêzê ku hin xusûsiyetên wî ragirtine û Sonya jî bi çavên xwe yê reş û tefiyayî û bi porê xwe yê reş û tevlihev jina herî nuwaze ya ber dilê wî ye. Hoksaziya girîft a weke hêmanên ser textebana kişikê ya ku pirê caran kêfê li mirov dişeriqîne, xwendevanan li şûnwarên Îngilistan, Almanya û Swîsreyê digerîne:

"Fikra mirov a li ser trapezên fezaya bistêrk difire, ligel matematîka li ser erdê vezeliyayî, dişibe torekê ku akrobatek ferq dike ku ew tor di eslê xwe de ne li wir e -Martin ji wan mirovan dihesidî ku ew ber bi sergêjiyekê ve diçûn û bi hesabekî nû tîrsa xwe dikuştin."



Ew "Hesta Yekbûyî" ku taybetmendiyêke sînestezîyê ye û bi Nabokov û gelek afirînerên cîhanê re hene, bûye sedem ku Nabokov berhemên girîft û mayînde biafirîne

Digel ku romana *Îhtîşam* di sala 1970'yî de bi alîkariya kurê wî, Dimitri Nabokov bi zimanê Îngilîzî bi navê *Glory* ji nû ve hatiye weşandin û bi zimanê tirkî jî di sala 2018'an de gihîştîye Turkiyeyê (Weşanên Îletîşim), anca min ew di adara 2019'an de li Swîsreyê xwend. Hêvîdar im weşanxaneyên kurdî bi alîkariya wergerên zimanê rûsî û Îngilîzî vê berhemê bigihînin xwendevanên zimanê kurdî û pê re jî berhemên nivîskêr ên dîtir bikin kurdî. Afirîner û kedkarê nivîs û wêjeya kurdî Celadet Alî Bedirxan û hevrêyên wî di rêyên wiha re bihurîne û qat bi qat zêdetir zorî, zehmetî û êş kişandine, lê ji ber ku ew azmûneyên xwe di qada wêjeyê de nenivîsandine û negihandine mirovan, em nikarin ti romanên wan ên wiha nasyar û navdar mînak bidin. Nabokov jî fena nivîskarên kurd xwedî zimanê cuda ye.

Dibêje: "Ez li Rûsyayê hatime jiyane, ez nivîskarekî amerîkî me ku beriya ez biçim Almanya -ku ez ê pazdeh salên xwe lê bibuhurînim- min li Îngilistanê wêjeya fransî xwendiyê... Serê min bi Îngilîzî diaxive, dilê min bi rûsî, guhê min bi fransî."

Mirov heyfa xwe tîne ku Celadet Alî Bedirxanê me yê bi heşt zimanî hebû!.. Vladimir Nabokov ji sala 1960'yî heta sala mirina xwe (1977) li bajarê Montreux ê Swîsreyê ligel malbata xwe li otêla Palacê jiyaye. Ji ber ku cihê gora wî nêzîkî bajarokê min e, ez çûm serdana gora wî: Min ji wê bilindahiyê piştî xwe da çiyayên Alpê, hinekî li gola Lémanê temaşê kir û hin hûrguliyên romana *Îhtîşamê* bi bir anîn. Bilindahiya ku fikra li ser trapezên fezaya bistêrk bi mirov re çêdike hê jî weke xwe ya beriya bi 50-60 salan e. Zimanê

wî yê weke muzîkê biaheng û dîmenên darîçav ên ku weke teqîna şampanyayekê di hişê mirov de hestên yekbûyî diafirîne. Ew "Hesta yekbûyî" ku taybetmendiyêke "Sînestezî"yê ye û bi Nabokov û gelek afirînerên cîhanê re heye, bûye sedem ku Nabokov berhemên girîft û mayînde biafirîne. Ew ji xaçepirsan hez dike, bengiyekî kişikê ye, berhemên xwe bi hişmendiyêke tevlihev diafirîne ku dixwaze xwîner xwebixwe tê bigihîjin, penaberek e ku ew jiyana penahendeyî di berhemên wî de teyisîye û bi figurekî mîtolojîkê ê bi navê "Sirin" diafirîne û bêtir jî di berhemên xwe de cih dide sembol û îşaretan.

'Hesta Yekbûyî'

"Sînestezî", peyveke yewnanî ye û tê wateya "Hesta Yekbûyî". Kesên sînestezîk dema hestekê dijîn, xwebixwe hestekê dîtir jî hest dikin. Mirovên sînestezîk, mirovan ne weke mirov lê bi awayê dîtbarî û bihîstyarî û nivîsyarî weke bûjen ango hêmanekê bi bir tînin û tê digihîjin. Ew bûjenekê bi pirhêlî dibînin û hest dikin, asta hişê wan bilind e û carna nikarin hesabên biçûk ên matematîkê jî bikin; hinekî xusûsiyetên wan dişîbin ên mirovên dîsleksiyê, hin bûyaran bi hesta dêja-vû'yê (jiyîna berê) dijîn û seheka wan a şeşemînî zehf xurt e. Dema guhdarîkirina muzîkê dîtina rengan, dema tehmîrkirina xwarînekê hestkirina teşeyên wan, li cem mirovên sînestezîkî azmûnên berbiçav in. Wêjeyan Goethe, wênesaz Kandînskî, Nikola Tesla, Richard Feynmann, muzîsyen Saradjev jî weke Nabokov çend kesên sînestezîk in.

Mirov dikare di romanên nivîskêrên bi navên *Maşenka*, *Jiyana Rasteqîn a Sebastian Knight*, *Îşaret û Sembol û Serkeftin (Îhtîşam)* de hêla wî ya xurt a sînestezîk bibîne. Wî di romanên xwe de sêwirînen şûnwar, dem û dîrok û bûyer bi hejmarê 6 rengîn û dewlemend kiriyê.

Nabokovê sînestezîk ku di berhemên xwe yê tevlihev de îşaret û sembolan bi kar tîne, bêtir hejmarê 6 di nav çend berhemên xwe yê giranbûha de bi cih kiriyê. Di *Îşaret û Sembolan* de lehengên wî jin û mêrekî cihû ne ku ji Awropayê koçî New Yorkê kirine û di nav xizaniyekê de dijîn. Kurê wan ê di nexweşxaneyê ruh û sînîrê de li ser hev hewl dide ku xwe bikuje. Lawik dînekî taybet e ku jiyana asayî weke şûnwarekî tijî peyamên nepen û xwedî hejmarên xweser dihesibîne. Dar û ber, av û hewa û hemû tişt der barê wî de diaxivin û di hemûyan de peyamên veşarî hene û ji ber ku nikare wateya van peyaman tê bigihîje li xwekuştinê digere. Di çîrokê de şîfrea veşarî hejmarê 6 e û ev di ser pêlêkirina tûşa "o" ya telefonê re tê dayîn. Jixwe di telefonên wê serdemê de tûşa "o" miqabilî hejmarê 6'ê ye û kesa ku pê li wê tûşê dike, di kirina xwe de bi israr e. Di romana wî ya yekemîn a bi navê *Maşenka* de hejmarê 6 weke sêwirîna şûnwar e:

"Pansiyon hem aydî rûsan bû û hem jî cihekî berbat bû... Li her du aliyan liwanê jî 6 odeyan ku li ser deriyên wan hejmarên gîrmote hebûn. Ev hejmar pelên ji salnameyê bûn ku di sedsala berê de hatibûn jêkirin. (6 rojên ji nisana 1923'yan)" Jixwe çîrok behsa 6 rojên leheng dike. Bi wî awayî li

ser nepeniya hejmarê 6'an bi dehan mînak hene.

Di romana *Jiyana Rasteqîn a Sebastian Knight* de jî hejmarê 6 bi çend awayan hatiye bikaranîn. Vebêjer û birayê wî 6 sal di navbera wan de hene:

"Ez piştî bi 6 salan li heman malê hatime dinê. Dema ku Sebastian tê gotin, lawikekî bi 6 salan ji min mezintir tê bira min." Di romanê de Sebastian Knightê ku romana "Serkeftin" diqedîne wiha diaxive: **"Sebastian li cihê ramediya dibêje, na Leslie, ez nemirim. Hîna nû min cîhanekê dîtir ava kir, ez weke xweda di roja hefte-mîn de xwe rihet dikim."**

Ji bo Nabokov hejmarê 6 têkildarî dem û şûnwarê ye. Roja şeşemîn şemî ye û ev roj ji bo cihûyan pîroz e. Hejmarê 6 weke têgehê jî di felsefeya kevin a Altruîzmê de hezkirin, berpîrsiyarî, mirovhezî û zanîne temsîl dike. 6 temambûna jiyane ya "Bihuştî Sererdê" ya di şeş rojan de nîşan dide. Di gelek çand û baweriyên de jî wateyên wê yê dîtir hene. Lê ji bo nivîskarê koçber Vladimir Nabokov hejmarê 6; bi wateya derbarê cihûyan de ku salên 1920 û 1940'î de nivîskêr şahidî li serpêhatiyên wan kir û ku nixrên mirovatîyê yê bîpêkirî bi şerêkî dijwar çawa bi destên mirovîne dîtir hatiye tunekirin. Jixwe jina wî Vera bixwe cihûyek bû.

Afirandinên sînestezîk

Ji bo ku mirov van afirandinên sînestezîk ên Nabokovî tê bigihîjin, divê hay ji rabirdûya malbata wî jî hebin. Malbata Nabokov bi pêkhatina şoreşa Bolşevîkan (1917) hemû dewlemendiya xwe li dû xwe dihêlin û dikevin ser rêya koçberiyê. Serê pêşîn ji Rûsyayê diçin Kirîmê û li wir jî ber şerê navxweyî berê xwe didin Îngilistanê. Di sala 1922'yan de bavê Nabokovî bi xefîkê li Berlîna Almanyayê tê kuştin, ew jiyana xwe li Berlînê didomînin. Di sala 1925'an de bi jina penaber a bi navê Vera re dizewice. Ji ber rewşa tevlihev a siyasî bi navnûtîkê "Sirin" nivîsên xwe dinivîse ku Sirin di wêjeya kevin a rûsî de çûka serjînik û bipêşîr e. Jixwe bi wextê re Sirin di wêjeya koçberên rûsî de dibe temsîlkarek. Romana wî ya bi navê *Maşenka*, berhema pêşîn a bi şewaza Sirinê hatiye nivîsandin.

Ew jiyana xwe heta salên 1940'î li Berlînê didomîne ku di van salan de gelek berhemên hêja diafirîne. Ji ber şerê Cîhanê dîsa rêya koçberiyê li ber vedibe û berê xwe dide Amerîkayê. Li zanîngehan dersên wêjeya cîhanê û Rûsyayê dide. Di vê serdemê de weke nivîskarekî bilingual (duzimanî), bi rûsî û Îngilîzî dinivîse. Berhemên xwe yê navdar *Jiyana Rasteqîn a Sebastian Knight* û *Îşaret û Sembol* dinivîse. Bi romana xwe ya bi navê *Lolîta* êdî serkeftina herî berbiçav dijî û di cîhana wêjeyê de digihîje asteke dîtir. Ji sala 1961'ê pê ve ligel jina xwe Verayê diçin Swîsreyê bajarê Montroyê û li otelekê bi cih dibin. Li otelê jî berhemdariya xwe didomîne, bi navên *Agirê Çilmisî*, *Biaxive*, *Bîr*, *Girav angî Arezû û Eslê Laurayê* berhemên dinivîse. Nabokovê ku di wêjeyê de weke dijberê Dostoyevskî jî tê binavkirin di sala 1977'an de li Montreuxa Swîsreyê çûye ber di-lovaniya xwedê û gora wî, jina wî Vera û lawê wî Dimitri li goristana Eugene-Rambertê ne.

Kurd dişîbin toriyan

Seyîdxan Anter

Nasekî min, navê rûpela xwe "Tora rengîn" daniye. Ma ne jixwe, Tor bi petêx, hejîrên bejî, tîrî û helîl, bero, belalûk û gelek fêkî û tehamên xwe yê din ve rengîn e. Her çiqas ger tu kaniyên serê Ava Sipî yê li nêwala Bûnîsra deynî aliyekî, ji çend kaniyên derdora Kerboranê pê ve Tor herêmeke dêm e. Lê "bade" ya wê jî ji xewn û xeyalên dût, kûr û rengîn re arîkar e. Di hunera mîmariya xwe de, ya bi kevîrên şehîrî û şîrîneka şereb û dîmsê a ji Marînê heta bi girê Mîra, ecêbmayî nemînin ku li cîhanê di radeya herî jor de ye.

Hewce nîne lê ez ê bêjim, Tor bi dengbêjên xwe bi nav û deng e. Belkî loma jî bi min, devoka kurdî ya herî kin, zelal, xweş û bi hêz ya li Torê ye! OL, êl û jî neteweyên cuda xelk lê dijîn. Loma jî gotina kirîv li Torê, xwedî wateyêke cuda ye. Tor bi sosyolojiya xwe jî herêmeke rengîn a. Hinekan ji heyama kevin de, ji bo bacê nedin "Romê" keska xwe girêdane û koka xwe birine war û demên nenas. Hinekan hem ola xwe û hem jî neteweya xwe terkîrine û bûne sîlahşorê desthilatdaran. Lê piraniya toriyan ji bo serfiraziyê li hember bindestiyê serî hil dane û hil didin.

Her çiqas mijara me ne ev be jî, van rojan kurd dişîbin toriyan. Kurdan gotiyê: "Xwedê me ji tacîrên Helebê û pêxwasên Amedê bipardêze!" Tacîrên Helebê em ji dukan-darên Qamişlo re dihêlin, lê pêxwasên me yê Amedê balkêş in.

Vêca destbirakê Apê Mûsa yê zindana Amedê, neviyê Elîkê Bettê, Bettê yê mîzîzexî, bi gotina toriyan ev serhatî ji min re got. Yek kêm yek zêde wiha bû; rojekê yekî torî diçe Amedê. Wê li dikanê firaxin bikire. Xelîtkê ji ber qayîşa li piştî xwe vedike. Peryan derdixê û pêxwasek xwe davêje peryan û bazdide. Yê torî lê dinêre û dibêje: "Pek ev çî xurt a!". Hîn wilo, pêxwaseke din îca li xwediyê xelîtkê nêzîk dibe û li halê wî dipirse, peryeyê mayî ji dest direvine. Yê torî dibêje: "Pek ew ji yê din jî xurtir a!"

Vêca ev jî kurd in. Sûr çû, Kerkûk çû, kurdan got desthilatdar bi hêz û jêhatî ne.

Şengal çû kurdan got dagirker ji desthilatdaran jêhatî in. Îca ger li Kurdistanê warên din ên stratejîk ji destê kurdan derên dê kurd çî bêjin em nizanin, lê ji her kesî ve kambaxî roj bi roj zelaltir dibe, her wiha careserî.

Derman em dizanin û gotinên Ehmedê Xanî yê yekitiya kurdan li ser zimanê me hemûyan in. Ji yê kor pîrsîne ka te çî divê? Kor gotiyê, çav. Lê cardin kurdan gotiyê: "Elametê nelêxistinê, rahiştina kevirê mezin e!"

Îro aramiya nav kurdan û lihevhatinên nav kurdan ku kes nikaribe li yê din bide, derman û mecalan ji yekitiya kurdan re peyda dike û rê li fitne û ficûran digere. Ma ne bes e ku êdî kes li me "bixwîne" û "nîvîştan" ji me re çêbikin?

Îca ev jî kurd in. Kerkûk çû, Şengal çû, gotina kurdan: "Xelk çî jêhatî ne." Ger ev helwesta kurdan dom bike, dê hejmarê jêhatîyan zêdetir bibe!

Li Başûr rojnameger tîn cezakirin

■ Felat Niştiman

Li başûrê Kurdistanê, xet û zordariyên li ser rojnamegeran her diçe zêde dibin. Sendikaya Rojnamegerên Kurdistanê du hefte berê rapora xwe ya bilançoya bînpêkirinên mafên rojnamegeran ên sala 2020'an yê li başûrê Kurdistanê aşkera kir. Li gorî raporê di sala 2020'an de, zêdetir 138 bûyerên bînpêkirinê li beramberî 365 rojnameger û 47 saziyên çapemeniyê hatine tomakirin. Di raporê de tê diyarkirin ku ev bînpêkirin; binçavkirin, lêxistin, astengkirina şopandina bûyeran, gilîkirin û girtina saziyên çapemeniyê ne.

Bi taybetî piştî çalakîyên protestoyî yê li hemberî hikûmeta başûrê Kurdistanê, yê bi daxwaza edalet û wekhevîyê, gelek kes hatibûn girtin û nêzî 70 çalakvanên sîvil û rojnameger hatibûn girtin. Hinek ji wan bi kefaletê hatin berdan, hinek ji wan jî hê di zindanan de ne. Tê gotin ku tevî rojnamegeran niha nêzî 20 kes di zindanan de ne.

Herî dawî jî cezayê girtîgehê li du rojnameger û sê çalakvanên sîvil hat birîn û ev biryara dadgehê rastî gelek bertek û nerazîbûnan hat.

Têkildarî cezayê li rojnameger û çalakvanan hatiye birîn û nerazîbûna gel, saziyên sîvil, partiyên siyasî, em bi rojnamegerê ji Başûr Dîfaa Herkî re axivîn. Herkî diyar kir ku bi taybetî ev çend mehên dawîn in, rojnamegerên li Başûr di bin xet û zordariyê mezîn de ne; rojnameger tîn girtin, gef li wan tê xwarin û cezayê girtîgehê li wan tê birîn û hwd.

Bi 'sîxuriyê' tîn sîncarkirin

Rojnameger Dîfaa Herkî ragihand ku 6 sal cezayê girtîgehê li rojnameger Şîrwan Şîrwanî (rojnamegerê ser-

Dadgehê cezayê girtîgehê li rojnameger û çalakîyên sîvil ên başûrê Kurdistanê birî û ev biryar rastî gelek bertekan hat. Rojnameger Dîfaa Herkî diyar kir ku piraniya partiyên siyasî, saziyên sîvil û gel li dijî biryarê derdikevin. Herkî ragihand ku ji bo wî bixwe jî biryara girtinê hatiye dayîn



Dîfaa Herkî

bixwe) û Gohdar Zêbarî (rojnamegerê ajansa Welat) û çalakvanên sîvil Şivan Seîd, Harîwan Îsa û Eyaz Kerem hat birîn. Herkî got ku rojnameger û çalakvanên sîvil bi 'sîxuriya ji bo welatên navdewletî û têkbirina ewlehiya niştîmanî' tîn sîncarkirin.

Bertekên sazî û partiyên

Herkî destnîşan kir ku piraniya saziyên sîvil ên mafên mirovan û rojnamegeran, balyozxanîyên navdewletî yê mîna Amerîka, Fransa, Almaniyayê cezayê li rojnamegeran hatiye birîn şermezar kirin û xwestin ew bîn berdan.

Herkî her wiha anî ziman ku ne tenê saziyên sîvil, partiyên siyasî jî nerazîbûn û bertekên xwe li hemberî girtina rojnamegeran nîşan didin. Herkî got ku Yekitiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK), Teverga Goran, partiya Yekgirtû ya Îslamî, pratiya Komela Dadgerî û Nîfşê Nû jî girtin û cazabîrîna li rojnamegeran şermezar

kirin û ew jî dixwazin rojnameger bîn berdan. Herkî ragihand ku seroka parlamentoya Kurdistanê Dr. Rêwaz Faîk, cîgirê serokê hikûmeta başûrê Kurdistanê Qûbad Talabanî jî xwestine rojnameger bîn berdan û dadgeh biryara cezakirina rojnamegeran betal bike û daxuyand ku 31 parlamenterên ji fraksiyonên cuda -ji bilî yê PDK'ê- li dijî biryara dadgehê der tîn û dixwazin rojnameger bîn berdan. Herkî balkişand ser bertekên gelê Başûr jî û diyar kir ku gel jî li dijî girtin û cezakirina rojnameger û çalakvanên sîvil pir bibertek e û nerazîbûnên xwe nîşan dide.

Dubendiya navbera Barzaniyan

Serokê başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û serokwezîrê hikûmeta başûrê Kurdistanê jî der barê rojnamegerên girtî de daxuyanî dan. Balêş e ku daxuyaniyên hatin dayîn dijberê hev in. Herkî têkildarî van daxuyaniyan destnîşan kir ku dubendî navbera Nêçîrvan û Mesrûr Barzanî de heye û wiha got: "Serokê başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ji Dad-

geha Bilind xwest û got ev biryar ne biryara dawiyê ye û dibe ev biryar bê guhertin. Di vê mijarê de, dubendî li nav PDK'ê û her wiha li nav hikûmeta başûrê Kurdistanê jî heye. Yê nêzî Mesrûr Barzanî bi awayekî û yê nêzî Nêçîrvan Barzanî bi awayekî din difikirin. Mesrûr Barzanî bi twitekê got ku ew ji aliyên dixwaze destwerdanê li kar û barên dadgehê nekin, ji bo dadgeh dikaribe bi awayekî serbixwe biryarên baş bide. Ev wek bersiveke li hemberî bertekan bû. Yê nêzî Mesrûr Barzanî rojnamegerên girtî û çalakvanên sîvil wek sîxur dibînin. Di daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî de ev kes wek tohmetbar nehatine hesibandin, ji bo wan gotiye ragirtiyan Behdînanê. Girtina van rojnamegeran nerazîbûnên di nav PDK'ê de zêdetir kirine, ango di navbera aliyên nêzî Nêçîrvan û Mesrûr Barzanî de."

Rojnameger Dîfaa Herkî di dawîya axaftina xwe de ragihand ku hêzên ewlehiyê yê başûrê Kurdistanê jî bo wî bixwe jî biryara girtinê dane û îhtimal heye ku di ew jî bê girtin.



Xweşkanî

Felemez Ulug

ENKS alîgirê yekitiyê ye?

Li Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê tevî hemû êrîş, kuştin, revandin û înkara qada navneteweyî, şênîyên herêmê bi hêza xwe ya cewherî, hewl didin destkeftiyên xwe yê bi xwîna hezaran cangoriyan hatine bidestxistin biparêzin.

Li herêmê bi pêşengiya Teverga Ci-vaka Demokratîk, ji destpêka şoreşê ve xebatên yekrêziya partî û saziyên li herêmê bi awayekî xurt tê kirin.

Di encama xebatek hêja û demdirêj de, tevî hemû kêm û kurtiyên hejî jî li dijî êrîşên dagirkeriyê û hewildanên înkarkirina îradeya gelê herêmê ya di qada siyasî de yekrêziyek sazî û partiyên herêmê hat avakirin.

Lê di heman pêvajoyê de, bi destwerdana dewleta tirk, PDK û ENKS'ê li dijî vî yekrêziyê xebatek neyînî tê kirin. Ev xebata ku bi nasnameya ENKS'ê ve tê kirin, di bingeha xwe de ji aliyê MÎT'a tirk û PDK'ê ve tê birêvebirin. Lewma hemû hewldan û hevdiandinên hêja, her tim ji aliyê vî pêkhatê ve ku ji aliyê hêzên derve ve tê birêvebirin, hatine xitmandin û astengî li ber wan hatine dextistin.

Di encama niyeta baş a Teverga Ci-vaka Demokratîk û Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurd de, ji bo bi ENKS'ê re lihevhatin çêbibe û li rojavayê Kurdistanê yekrêziya partiyên kurd bê avakirin, bi îsrar xebat hatin kirin.

Tevî hemû hewildanên erênî yê PYNK'ê jî ENKS'ê nikare di asta tê xwestin de, tev li vî xebatê bibe. Sedema vî jî bêguman dewleta tirk û PDK ye. Ji ber ku ENKS bi van aliyên ve girêdayî ye, ne gengaz e bikaribe ji bo pêşxistina yekrêziya kurd xebatek erênî bide meşandin.

Niha hin alî bi zanebûn nîqaşên gera sêyemîn a danûstandinên PYNK û ENKS'ê li Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê dixin rojevê. Ev guhertina rojevê ye.

Bêguman ji bo yekitiya neteweyî ya kurdan gavên girîng hatine avêtin, lê ne ENKS û ne jî PDK'ê girîngiyek pêwîst nedan van bang û daxwazan. Dert û daxwazên wan ew in ku destkeftiyên li Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê hatine bidestxistin, mîna başûrê Kurdistanê bîn parkirin.

Bêguman divê hemû partî û saziyên kurdî bi erka yekitiya neteweyî rabin. Divê gavên bîn avêtin li gorî berjewendiyên gelê kurd bin. Lê çawa ku li başûrê Kurdistanê PDK li pêşiya yekitiya neteweyî asteng e, li rojavayê Kurdistanê jî ENKS bi heman erkê radibe û niyeta baş a PYNK'ê pûç dibe.

Ev her du alî jî li gorî perspektîfên MÎT'a tirk tevdiagerin û nêzî mijarê dibin. Lewma nêzîkatî û helwesta wan jî nabe kurdistanî.

Divê destkeftiyên şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê werin parastin û herêmên ji aliyê dewleta tirk ve hatine dagirkirin werin azadkirin. Li gorî vî daxwaz û hêviyên gelê kurd ji ENKS'ê ew e ku li gorî vî rastiyê nêzî xebatên yekrêziya neteweyî bibe. Lewma divê beriya her tiştî li hemberî neyarên gelê kurd xwedî helwest be.

Bêguman ev hewildanên yekitiya neteweyî yê di navbera PYNK û ENKS'ê de, ji bo siberoya Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê pir bi qîmet in. Lê divê baş bê zanîn ku mîna her neteweyî ya ci-vakê, gelê rojavayê Kurdistanê jî mafê xwe heye ku çarenûsa xwe ew bixwe tayîn bike. Ji bo vî jî lihevkarîna aliyên kurd bi qîmet e, lê şantajên ENKS'ê yê li ser îradeya siyasî ne çêker in.



Amerîka û Îsraîl dê bicivin

Di sala 2009'a de, piştî serdana serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu ya li Qesra Spî ya Amerîkayê, der barê stratejiya nukleerî ya Îranê de koma xebatê hatibû damezrandin. Li gorî malpera Axiosê ya amerîkî DYA û Îsraîl der barê ji nû ve destpêkirina civînên koma xebata stratejîk a Îranê li hev kirin. Tê payîn

ku di rojên pêş de dê civîna yekemîn a der barê agahiyên istixbaratê yê bernameya nukleerî ya Tehranê de were lidarxistin. Li gorî malpera amerîkî di civîna ku wê online were lidarxistin, Îsraîl dê girîngiyê bide agahiyên istixbarî û daneyên der barê bernameya nukleerî ya Îranê.

WASHINGTON



Cemiyeta Kurdistanê xelat da Xwebûnê

Rojnameya me ya 23'yê 2019'an de dest bi weşanê kir, xelata xwe ya yekemîn girt. Xelat ji aliyê endamê Cemiyata Rojnamegerên Kurdistanê (CRK) Ferad Mamedoglu ve hat dayîn. Cemiyata Rojnamegerên Kurdistanê, çend sal in der barê rojnamegeriya kurdî de dixebite. Cemiyetê xebat û xizmetên rojnameya me Xwebûnê yê jî bo parastina zimanê kurdî pîroz kirin û xelat da rojnameyê. AMED



Baydemîr serdena Hewlêrê kir

Parlamentêrê berê yê HDP'ê Osman Baydemîr çû Hewlêrê û bi serokwezîrê başûrê Kurdistanê Mesrûr Barzanî re civiya. Hat diyarkirin, di hevdiandinê de ku li avahiya serokwezîriyê pêk hat, mijara têkoşin û hewlên ji bo yekitiya neteweyî û parastina mafên kurdan hat axaftin. Lê heta niha der barê hevdiandinê de ji her du aliyên ve jî daxuyaniyên fermî nehatine dayîn. Hêjayî gotinê ye ku demên dawî xebatên yekitiya neteweyî ya nava kurdan hatine lezkirin. HEWLÊR



Çalakiya gelê Şengalê bênavber didome

Di 9'ê cotmeha 2020'an de, di navbera Bexda-Hewlêrê de peymanek li ser Şengalê hatibû îmzekirin. Peymana ku bi daxwaza PDK û Bexdayê jî bo durrîstina hêzên asayîşa Şengalê hat amadekirin rastî bertek û nerazîbûnên gelê êzidî hatibû. Piştî vî yekê jî gelê Şengalê li hun-

dir û derveyî welat dest bi çalakiyan kiribû. Welatiyên Şengalê di çerçoveya li dijî peyman Bexda û Hewlêrê de bi armanca pişgiriya ji bo Asayîşa Êzîdxanê li pêşiya Navenda Asayîşa Şengalê kon vedabûn. Çalakiya ku bi dirûşma 'Em hemû asayîş in' hatiye destpêkirin di

roja xwe ya 87'emîn de ji aliyê meclis û saziyên Şengalê ve dewam dibe. Gelê Şengalê kom bi kom serdana konê berxwedanê dikin û pişgiriya xwe ya ji bo çalakiyê tînin ziman. Şengalî dibêjin, heya daxwaza wan bji cih neyê dê dev ji çalakiya xwe bernedin. ŞENGAL

Gelê belûc serî hilda

Navenda Nûçeyan

Dewletên desthildatdar her tim li gor berjewendiyên xwe welatên li Rojhilata Navîn parçe kirine. Yek ji van gelên Rojhilata Navîn belûcî ne. Belûcî yek ji neteweyên qedîm ên Rojhilata Navîn in ku li Îran, Pakistan, Afganistan, Kendava Ereban û Hindistanê belav bûne. Heta roja me ya îro jî li van welatan jiyana xwe didomînin.

Belûciyên ku di navbera çend welatan de hatine parçekirin, ji hemû mafên xwe bêpar mane. Di dîrokê de di serdema Sefewî, Qaçar, Pehlewî û heta Komara Îslamî de jî, her tim zilm li wan hatiye kirin û wan li dijî vê zilmê serî hil daye. Helbet tenê ne li Îranê, li Pakistan, Afganistan, Hindistan û Erebanê jî mafên wan ên sereke hatine binpêkirin.

Di 23'yê sibatê de, leşkerên Îranê li bajarê Serewanê bi ser parêzgeha Belûcistanê ve, êrîşî kolberên belûcî kirin û li gor daneyan 10 kolber hatin kuştin. Li ser vê yekê, ji bo çalakiyan bang li gel hat kirin. Piştî bangê, li gelek bajaran belûcî rabûn ser piyan û li dijî qetilkirina kolberan daketî qadan.

23'yê sibatê artêşa Îranê êrîşî kolberên belûcî kirin û 10 kolber qetîl kirin. Gelê belûcî bi çalakiyên girseyî li dijî vê qetîlamê derket

Xwepêşander gulebaran kirin

Li gorî agahiyên çavkaniyên herêmî, rejîma Îranê bi sedema xwepêşandanan deriyên hemû saziyên hikûmetê yê fermî girt û hêzek zêde ya leşkerî li bajarê Serewan bi cih kir. Piştî ku hêzên ewlehiyê êrîşî xwepêşanderan kir, alozî derket û gel berê xwe da navendên îdarî û leşkerî yê bajêr. Biryargeha Qudisê ya Supay Pasdaran, Navenda Polîsan û çend saziyên din ên li bajêr ji aliyê xwepêşanderan ve hatin dorpêçkirin û hêzên leşkerî xwepêşander gulebaran kirin. Bi êrîşê re gulebarandina leşkeran gel berê xwe da qeymeqamtiya bajarê Serwan û ketin nav avahiya qeymeqamtiyê. Roja pêşî, li bajêr tu kontrola hikûmetê nema.

Çalakî her çû belav bû

Xwepêşandanan gelê belûcî di nav hefteyê de her çû belav bû û piştî bajarê Serewanê, li Zahîdan û Kurnî Sercengel jî gel daket qadan û bi ser avahiyan Supayê Pasdaran de girtin. Li gorî dîmenên ku li ser medyaya civakî hatin belavkirin, hejmarek zêde ya leşkerên rejîmê ku nikarin

li beramberî nerazîbûna gel li ber xwe bidin û ji bo vê yekê jî navendên xwe vala kirine û derdiketin derveyî bajêr.

Daxuyaniya KODAR'ê

Der barê xwepêşandanan û êrîşên hêzên rejîmê de, Komelgeha Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) qetilkirina 10 kolberên belûcî weke tewanek mezîn a li dijî mirovahiyê û gelê belûcî pênase kir û ragihand ku rapêrîna gelê belûcî a li dijî rejîma Îranê mafek demokratîk e û divê gelên Îranê bi yekîtiya xwe bersiva hovîtiya desthilatdariyê bidin.

Banga platforma demokratîk

Platforma Demokratîk a Îranê jî bi daxuyaniyê nivîskî ragihand ku ew bi têkoşîna gelê belûcî re ne û cîna yê Komara Îslamî ya li Serawanê jî şermezar kir. Platformê di daxuyaniya xwe de bang li hemû gelên bindest, azadîxwaz, saziyên mafê mirovan, ragihandinên demokratîk û azadîxwaz kir, da ku piştgiyê bidin gelê belûcîbelûcî.

Tevliheviya li Ermenistanê zêde dibe

Navenda Nûçeyan

Piştî peymanê rawestandina şerê di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de, li Ermenistanê nerazîbûnên mezîn li dijî serokwezîr Nikol Paşinyan derketin holê. Di encamê de gelek xwepêşandan li seranserê Ermenistanê hatin lidarxistin û daxwaza îstifakirina serokwezîr kirin. Di xwepêşandanan de gel ji bo Paşinyan dibêje ku ew teslîm bûye û parçeyekî ji axa Ermenistanê radestî Azerbaycanê kiriye.

Bi zêdebûna xwepêşandanan re, nerazîbûnek bi vî rengî ji aliyê artêşa Ermensitanê ve jî hat nîşandan û artêşê banga îstifakirina li Paşinyan kir.

Paşinyan piştî bangewaziya artêşa Ermenistanê ya ji bo îstifaya wî ku li ser malperên civakî hatibû belavkirin, nerazîbûn nîşan da û der barê mijarê de axaftinek kir.

Paşinyan di axaftina xwe de bang li alîgirên xwe kir ku li dijî



vê bangê ji bo piştgiyariya wî dakevin kolanan û wiha got: "Em di rewşeke gelekî dijwar re derbas dibin û pêwîst e em şoreşa xwe biparêzin."

Ji bo nerazîbûna li dijî daxuyaniya artêşê jî wiha got: "Min biryar da ku sererkanê artêşê ji peywirê bigirim. Li hemberî gefên artêşê ve gavê peywira herî girîng parastina desthilata sîvil e."

Her wiha Paşinyan berpirsiyariya têkçûna li Qerebaxê avêt ser rayedarên artêşa welêt û got: "Hin pirsên gel ji rayedarên payebilind ên artêşê hene û ew nikarin van pirsên gel bibersivînin."

Li Başûr perwerdeya jineolojiyê

Navenda Lêkolînên Jineolojiyê ya Silêmaniyê, ev demek e ji bo danasîna xebatên jineolojiyê û çareserkirina pirsgrêkên ku jin û civak ji ber hişmendiyê desthilatdariya mêr dijîn, xebatên perwerdeyê dibe.

Navenda Lêkolînên ji aliyê zanistî ve bipêşxistina jinan de heya niha gelek semîner, panel, çalakiyên hunerî li dar xistine. Herî dawî jî bo jinên mamoste, parêzer, rojnameger û hunermend jî du dewreyên perwerdeyê vekirine.

Di darsa yekemîn a jineolojiyê de bi sernavê 'Çima Jineolojiyê' perwerde hat destpêkirin. Di çarçoveya paradîgamaya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan 'Civaka Demokratîk, Eolojiyê û Azadiya Jinan' de, li ser çareseriyên nakokiyên qirkirina civak, jinan û jinan nîqaş hatin kirin.

Di darsa duyemîn de etîmolojiya ango koka peyva 'Jin û Lojî' û her wiha di warê civaknasî û pênasîya têgînê de nîqaş hatin kirin. Di darsa sêyemîn de jî mijara ontolojiyê (zanista hebûnê) hat nîqaşkirin. Gotinên ku heya niha di mîtolojiyê, dîn, felsefê û zanistê de ji bo jinan hatine gotin, gotinên ku di nav civakê de ji bo jinan tîrî bîkaranî û gotinên pêşiyên hatin şîrovekirin û tehlîl kirin. Di darsa çaremîn de jî mijar epîstemolojiya jinan bû.

Jinên tev li perwerdeyê bûn, ji navendê xwestin dewreyên perwerdeyê bidomin.

Li gor agahiyên navendê parve kirin, dê dewreyên perwerdeyê her meh werin kirin û di meha adarê de jî ji bo mîran dewreyên cuda yê perwerdeyê bîrînin. **SILÊMANÎ**



Destar

Ehmed Pelda

Zanîna xwendina zimanê xwezayê

Hemû cure zanistî şagirtê xwezayê ne. Bi saya xwendina zimanê xwezayê mirovahî li xwe hay bû. Teşeyên hînbûnê, bikaranîna hiş, çêkirina ezmûnan, jêgirtina encaman, ezberkirina agahiyan bi destê hostayê mezîn, xwezayê diyarî me bûne.

Pirtûka bêdawî ya qewî, xweza bi xwe ye. Em çiqas giraniyê bidin xwendina vê pirtûkê, em ê ewqas jîr, şanaz û hişyar bin. Lê gelo mirovahiyê ev firsenda payebilind, mîrateya bêdawî û pîroz çawa dîtîye û bi çi tehrî bi kar aniyê?

Pîroziya xwezayê

Wexta destpêkê, destpêka lixwehaybûna hebûnê ya mirovahiyê, bi xwendina zimanê xwezayê bişkiwî û zil da. Bi rê û resmên xwezayê rê û dirbên meşa şaristaniya me vebû. Tiştên herî zelal û xav; av û çêre ne, dikarî bi hêsanî xwe pê tîrî bikî. Wek şîrê dê û dilgermiya wê ya dilovan. Jixwe hêmayaya dayik û xwezayê li beramberî hev in. Çawa dayik şîr, can, rih dide, dilgermî û heskirinê dide, xweza jî di

paşila xwe de me dihewîne, diparêze, tîr dibe û difikirîne. Em ji ber hebûna xwe şaşmayî û kêmbersiv in. Lê kêfxweş in û ji aferînerê xwe jî hez dikin ku di asta pîroz de dibînin.

Belê em li kîjan devera cîhanê jiyân û kîjan perçeyî em parast û feyde da me, ji bo me pîroz bû. Ew çiyayê ku me mala xwe spartibûyê pîroz dibû. Ew çem û robarên ku me ji wan av vedixwar û di jiyana me de xwedî roleke mezîn bûn, li ber çavê me wek xwedê pîroz bûn; layiqî peristin û rî-tûelên dîni bûn. Wekî vê sewalên ku feyde didan jî hevalbend û pîroz bûn.

Lê xetere jî hebûn. Rawirên dirinde, asoyên çiyayan, avên zerp dikîşyan, çêreyên jehrî... dibûn sebeba tîrsê ku xwê jê vebigirin. Bi vî awayî tiştên pîroz û xêrdarî û tiştên nepîroz û tîrsdayî pêk hatin.

Vê rewşê dîtina me jî guhert. Hîzrên dualî, guman, dubendîtiyê pêk hatin. Başî û nebaşî, çêyî û neçêyî, rindî û nerindî, qencî û xerabiyê hînbûn. Ev bû sebab ku em her tiştî rûberî hev bikin, bi dîtî û gotinekê em

nikarin bi ser bikevin.

Ev jî nîşaneya sazûmaniya şaristaniya me bû.

Pîroziya peyamnêriyê

Me xwest, her gav xwe bi erênîyê re bigirin û xwe ji neyîniyê biparêzin. Ji ber vê divê em nas bikin. Pîvana erênî û neyîniyê, başî û nebaşiyê hînbibin. Wekî ava çem pîroz e, ji ber ku vedixwî, lê heke rastî asoyên wê bêyî dixeniqî. Agir baş e ku xwarinê pê dipijîni û xwe ji dirindeyan diparêzî, lê xwe jê neparêzî te jî dişewitîne. Tav can dide xwezayê, germahiya zêde wek çolê her tiştî diqurimîne, hişk dibe.

Lewma divê hevsiyeyek hebe û tu vê bizanîbî ku xwe biparêzî. Ew ên ku hûr û kûr li ser vê mijarê mitalên xwe kirin, bi ezmûnên xwe peyam dan û rê li ber me xistin. Li ber çavê me şîrîn û pîroz bûn. Ji ber ku rêberiya me kirin. Wekî xwezayê çend ferh/tîp/peyvên xwe diyarî wan kirine. Hinek van wek hosta, hinek wan wek feylesof û hinek jî wan wek pêxem-

ber/peyamnêr hatin binavkirin.

Pîroziya zanistê

Dem derbas bû, zeman kemilî, xwendeyên xwezayê zêde bûn. Rê û rêbazên tevgera xwezayê yê nû hatin dîtîn. Bi riya jimariyê, ezmûnan, dîtina cewherên kanên cuda gelek derfet çêbûn. Bi saya vê zanîna mirovan, wekî ya berbiçav û ya neberbiçav jî bi pêş ket. Pergalên ramanê yê nû cuda û cihêreng peyda bûn.

Wer hate xuyanê ku zanîna peyamnêran ne bes e û tenê dîtineke misoger ya zimanê xwezayê jî nîne. Wekî ziman û zaravayên heyi dîtînen cihêreng jî hene. Lewma cure bi cure peyam, gotin û nîşan, dibistan, ekol û edetên jiyânê wek cihêrengiya xwezayê pêk hatin.

Hostatiya çêkirinê jî bi pêş ket. Êdî tenê ji xwezayê girtin, nixumandin û piştî wextekê bikaranîna tiştan ne bes bû. Hebûna cewher û hêşînahiyê, hêza av, agir û hewayê hat bikaranîn. Veçirandin, vereşandin, veguherîna li ser dirûvekî din an cew-

heran pêk hat. Bi lêdanê, bi hûrkirinê, bi kelandinê, bi qelandinê û li gor pîvanên tevlihevkirinê alav û amûrên mekanîk çêbûn.

Pîroziya quretiyê

Roj hat, mirovahî gihîşt wê qadê ku xwe wek serdestê xwezayê dît. Zimanê xwezayê, rê û dirbên heyi yê xwezayê red kir. Wer bawer kir ku dikare hevсарê xwezayê li gorî dilê xwe bikişîne û bi saya zanista xwe wê ji bo berjewendiyê xwe bihajo. Piştî xwe da xwezayê û berê xwe dan hev. Şerê hev kirin. Hebûnên xwezayê jî ji bo armancên xwe bi kar anîn.

Lêbelê xweza hemû zindiyên di nav hevsiyeyekê de diparêze. Heke mirovahî ji xwe hay nebe, xweza hêwirzayan radike. Nexweşiyên cuda cuda rû didin. Ba û bahoz radibin, çem û robar dimiçiqin, daristan dişewitîn. Pêlên deryayan şaristaniyan dadiqurtînin, atmosfer qul dibe, hilma jehrî peyda dibe...

Belê heke em li xwe hay nebin, em ê tune bibin, lê wê xweza her hebe.

Teoriya sîmulasyonê: Gelo em di sîmulasyonekê de dijîn? ¹



Bilal Ata Aktaş

Ji sala par ve hingê şewba hanê dest pê kirîye, meraqa min a li ser sosyo-polîtîkaya jiyana rojane her gurtir bûye. Hima çî were ber min hewl didim bixwînim, binêrim, guhdarî bikim. Qet nebe li gor mijarên taybet wan bisenîfînim. Ija çend rojên ewil gava ku ez li dosyeya xwe vegeyîyam, min dît ku der barê fezay û felsefeya tîkildarî wê de gelek materyal tov bûne. Di nav van mijarên spesîfîk de jî mijara ku der barê wê de materyal herî zehf in, teoriya sîmulasyonê ye. Jixwe çend mehên ewil dîsa li vir bi rûxalî min qala wê mijarê kiribû (binêr : herkes li ku derê ye?). Ija anha bi bêhneke fireh û lezzetêke din ez ê dîsa berê xwe bidim wê mijarê û dest bi rêzênîseke dirêj bikim. Her çiqas meraqdar û sewdaserê wê mijarê bim jî, amatorî her berdewam e. Lewra fikr û ramanên xwe teksîr nekin, falsoyan efû nekin. Belkî me li ser wê meseleyê civatek jî gerand li ser clubhouseyê.

Teoriya sîmulasyonê çî ye ?

Ka em ji sîfirê dest pê bikin, bi pêna-

sekirinê. Teoriya sîmulasyonê ew teorî ye ku dibêje em di sîmulasyonekê de dijîn û hemû tiştên li derdora me, em jî tê de, xewn û xeyalên me, diya me, gundê me, pişkulên pezan, dinyaya me, eşyayên tê de, heta gerdûn bixwe jî ne rast in. Hemû sîmulekirî ne. Yanî sexte ne û bi kompîtîrekê hatine çêkirin. Her tiştê ku em dibînin, dixwin, bêhn dikin, temas dikin, guhdarî dikin, ji bilî çend kodên kompîtîrê wêdetir ne tu tişt in. Ango di pratîkê da em tune ne, bes hişê me heye. Ev teoriya ku li ber guhê me heya bêjî fantastîk û surreal e, xwedan argumanên xurt ên zanistî ye.

Heywanên mîna me, ji bo fahmkirina derdora xwe hewceyî senifandin û kategorîzekirinê ne. Çimkî hişê me nikare ewqas agahiyên li derdora xwe bixebitîne, hemûyan fahm bike. Loma bi demê re em fêrî kategorîzasyonê bûn. Mîsal, bêhna pîs di hişê me de hima her tim tîkildarî tiştên xeternak e. Çimkî tê de îhtimala mîkrobên ku zirarê bidin me zêde ye. Loma em otomotîkmen ji bêhna pîs aciz dibin. Yan jî heger em li xerîbiyê hemşeriyekî xwe yê ku me heta wê çaxê qet nedîtîye bibînin kêfa me tê. Çimkî bawerîya ku bi me re çêdibe ji kategorîyekê tê, ne ji şexsê wî hemşeriyî. Bi vî hawî, em ji pîrsên ku ji

biyaniyekî bîn pîrsîn xilas dibin û him ji enerjiya xwe him jî ji wexta xwe teserûf dikin.

Bi demê û pêşveçûnên teknolojîk re, kategoriyên me jî, agahiyên ku divê bîn şixulandin jî zêde bûn. Mîsal em êdî ji kesên ku fotrafên xwe yê tenîlê parve dikin nefret dikin an jî ji wan hez dikin bêjî ku em şexsên wan nas bikin. Êdî heyateke bêjî senifandinê ne mimkûn e. Jixwe berê jî wisa bû lê zemanê me ev yek êdî bivênevê kir. Çimkî em di nav agahiyên ku divên bîn fahmkirin de digevizin. Loma agahiyên li derdora me çiqas zêde bin, pêdiviya me ya senifandinê jî ewçend zêde dibe. Lêbelê ev tişt bi tena serê me nîşaneya başbûnê an jî xirabbûnê nîne. Senifandin, carna xirab û xeternak e jî: « tev sûcê cihûyan e. »

Axirî baweriyên çêkirî ne xema peresane ne. Ew ji exlaq û etîkê bêtir metodek e. Ji bo dewamiya genên me çî hewce be, ew girîng e ji bo wan. Bi qewlê Dawkinsê peresanger ê navdar, hemû laş û baweriyên me ji bo parastina genên me ji qalîkekê wêdetir ne tu tişt in. Gava meriv bi vî hawî li xwe û li derdora xwe dinêre, ferq dîke ku di çerxa qeraxê ya xwezayê de qedrê wî ewqas jî ne girîng e. Belkî li kozmosê, li derekê şaristaniyêke din jî heye û wilo difikire der barê me de?

Ev pîrs him xofa dilê me zêde dike him jî kelecaneke dide merivan. Tîrsa ser dilê me zêde dike çimkî heger mexlûqên wisa hebin û ji hêla şaristaniyê ve bi milyon salan ji me çêtir bin dibe ku em li ber çavê wan ne hêjayî wan mîkroban bin ku li ber çavê me ne. Yanî belkî em ji bo wan di kategorîyêke wilo bêqîmet de ne ku tenezil nakin bi me re tîkiliyê deynin. Lê ji aliyê din ve jî, belkî ew jî mîna me meraqdar in û ji ber sedemên cuda kozmosên cihêreng ava kirine û em xistine navê, mîna keriyê pezan me telbe dikin. Belkî jî nan û ava me ew didin, cil û bergên me ew hildibijêrin, dijmînen me ew diyar dikin, navên zarokên me ew datînin. Belkî jî em pêlîstokên gedeyekî şûm û kurmî ne ku çarenûsa me bi çend kodên kompîtîrê di destê wî de ye?

Gotara Nick Bostrom

Pêşveçûnên teknolojîk heya niha tiştên kesnedî, kesnebihîstî raxistin ber çavên me. Bi qewlê Elon Musk, 40 sal berê lîstîkên kompîtîrê jî çend çizgiyan pêk dihatin, lê niha em behsa lîstîkên hîper-realistîk dikin. Dibe ku piştî 40 salan heman lîstîk jî jiyana me bixwe realisttir bibin. Ma jixwe em ji niha ve tevî her lîstîkekê dinyayêke nû na-afîrînin? Heger teknolojiya cîsnê me timî berjor biçe, belkî rojekê em bişên jiyana xwe jî sîmule bikin. Baş e, heger ev yek li pêşerojê mimkûn be, em ji ku dizanin ku em vêga nayên sîmulekirin?

Bersiva vî pîrsê astrofizîkanê swêdî yê ku li zanîngeha Oxfordê dixebite, Nick Bostrom, di 2003'yan de bi gotarekê dide "Gelo hûn di sîmulasyoneke kompîtîrê de dijîn?". Bostrom yekem kes e ku der barê wê teoriyê de gotareke zanistî nivîsiye. Di nivîsa xwe de dibêje beriya ku em bîn sîmulekirin, divê çend şert û merc bîn bicihanîn. Heger yek ji wan jî neyê çewtkirin, wê demê em di sîmulasyonekê de dijîn. Şertên wî wiha ne:

- Divê ji bo sîmulekirina hişê me tu astengî tune be: kes bi temamî nizane ka hiş çî ye û çawa xwe însa dike. Lê bi vî şertê armanc ew e ku ji hêla zanistê ve divê em rojekê bikaribin hişê xwe teqlîd bikin, qopayêke wê derxin.

- Pêşveçûnên teknolojîk divê di demê nêz de qut nebin: heger teknolojî bi vî hawî dewam bike û bandorên pê re koka me neynin, em ê rojekê bigihîjin asteke wilo ku bişên hemû enerjiya galaksiya xwe bi kar bînin. Di îhtimaleke wilo de, ji bo sîmulekirina jiyana bi milyonan însanan trîlyon car trîlyon kirar hewce dike.

- Divê şaristaniyên pêşveçûyî xwe hildinewêşînin û ji holê ranekin: lê dibe ku hemû şaristanî piştî pêşveçûnekê rastî sî-norekî tînen û xwe tune dikin. Şerekî nukleerî, guherîna avhewayê yan jî çalereşek dibe ku der barê me de gotina dawî bike. Dibe ku jiyana bixwe jî li ser xwe-tunekirinê programkirî be. Heger wilo be em nikarin qala tu sîmulasyonekê bikin. Lêbelê her çiqas îhtimala qirkirineke giştî berdewam be jî, cîsnê me heya niha tu demêke wiha aştiyane nedîtîye. Yanî bicihanîna vî şertê jî pêkan e.


- Divê xîret û daxwaza şaristaniyên pîr-pêşveçûyî hebe ji bo sîmulekirinê: heger teknolojiya wan a sîmulasyonê hebe lê bi kar neynin teoriya me tîk diçe. Şerteke sade lê bivênevê ye.

- Heger gelek sîmulasyon hebin, bi îhtimaleke mezin hûn jî di yek ji wan de dijîn: çimkî heger hêza wê şaristaniyê ji bo şixulandina sîmulasyonekê hebe, divê ji bo bi hezaran, bi milyonan sîmulasyonan jî hebe. Axirî em wilo ferz dikin ku şaristaniyên li pêş me xwedan hêzeke ezamet a kompîtîrê ne. Nexwe bi vî halî bi milyonan kozmosên sîmulekirî hebin, divê bi trîlyonan mexlûqatên hişdar jî hebin tê de.

Baş e lê em argumanên vî camêrî çawa test bikin? Heger em nikaribin test bikin nexwe çima zanistî ne? (didome)

Çavkanî:

- Axaftina Elon Musk: Are we in a simulation? – Elon Musk (Youtube)**
- Gotara Nick Bostrom: Are you living in a computer simulation?**
- Nutshell: Is reality real? The simulation argument (Youtube)**
- Kitêba Richard Dawkins: The selfish gene**



Tirkiye amade ye ku bibe hêzeke nukleerî?



Kurdistan Lezgiyeva

Pêvajoyên jeopolîtîk bi cewherî pir dişibin zagonên xwezayê. Ew di dîrokê de hinek bi rola kesane ve jî girêdayî ne. Tirkiye her çiqas hewl bide, xwe ji xwedibûna çekên nukleerî dûr bixe jî, ew ê (pêvajoyê û qanûn) bi her awayî wê neçar bikin ku wan bi destê xwe bixe.

Bi hişkî ve "klûba atomê" ne amûrekê hêza gerdûnî ye. Encamên bikaranîna wê ji bo yê ku ew sepanîye jî neyînî ye, heke ew bi ser bikeve jî. Çekên nukleerî amûrên şiyarbûnê ne, cureya karta paşîn in ku wiha tê gotin ji bo wê, "wisa be em bi hev re bimirin". Ji ber vî yekê, ji DYA, Rûsya, Çîn, Koreya Bakur re hewce ne, het astekê ji bo Pakistan û Hindistan jî. Lê heta xwedîkirina wê ji bo Fransa û Brîtanayê jî,

berî her tiştî statuyek e ne leşkerî ye.

Ew ji bo Îsraîl û Tirkiyeyê bêhtir bêkêrin. Bûyerên li Rohîlata Navîn diqewimin, hinekî dişibin rêzgirtina li qaîdeyên nenivîsandî. Heta berovajî, pêdivî bi aqilê selîm û mantiqê heye. Mîna çakêtê sor, çente û zincîra zêr a kîlogramî, li dora stûyê Rûsya nû ya salên 90'î.

Her çiqas Enqere hesreta vejandina împaratoriya Osmanî li ber çav digire jî, li gor armancên Enqereyê pêdivî bi bikaranîna çekên nukleerî tune ye. Bi bombeya nukleerê teqandina paytexta dijîmîn misoger nake. Berovajî, gavek wisa dê bibe sedema kombûna dijberan, berfirehkirina hovîtiya şer û berteka hêzên cihanî.

Di heman demê de, bi dizîya serîk û teknolojîyên jî welatên xwedan çekên nukleerî jî, bidestxistina cebîlxaneyê xwe bi mesrefên pir giran ve girêdayî ye. Zêdetirî vî yekê, gelek xalên lawazbûnê hene ku bi zelalî di mînakên bernameya nukleerê ya Îranê de tê dîtin. Çend caran dezgehên pî-

şesaziye yê pê re tîkildar in hatine teqandin? Amûrên nukleerî tînen xirabkirin. Pêdivî ye ku ew her 20-30 salan carekê werin nûkirin.

Bi gelemperî, gelek mesref û serêşî hene. Ji ber vî yekê, serokatiya Tirkiyeyê

demek dirêj jî ve ramanê dûr ket. Di îlona 2019'an de, Erdogan bi aşkerayî diyar kir ku welatê wî nedixwest çekên nukleerî bistîne. Îsraîl bi serhişkî jî "bersiva raste-rast" a li ser daxwaza Ajansa Enerjiya Atomê ya Navneteweyî direve û Tehran ji

berê ve bi aşkerayî qala planên bidestxistina "plutonioma metalîk" dike, ev formek e ku hem di enerjiya nukleerê de û hem jî di pêvekîrîna serîkên nukleerê de bi heman rengî tê pêkanîn û bikaranîn. Gotinên Erdogan ên li Foruma Aboriyê ya Anatoliya Navîn a li Sêwasê ku dibêje hîn jî pêwîst e Tirkiye bibe xwediyê çekên xwe yê nukleerî, ecêb nayê dîtin.

Analistê navdar Yakov Kedmi rewşê bi zelalî vegot: "Çekên nukleerî, em bixwazin an nexwazin, baş an xirab, dibin yek ji heman çekên sedsala 21'ê. Divê em wisa fêhm bikin û nêzik bibin."

Li gorî Kedmi, wê welatên Rohîlata Navîn 10-20 salên din bibin xwediyê çekên xwe yê nukleerî. Di heman demê de, ji hêla îstixbarata Îsraîl û welatên rojavayî ve jî tê gotin. Her wiha di rastiyê de, xetereyên bikaranîna serîkên nukleerî yê taktîkî jî zêdebûnekê cidî ye. Pir ne gengaz e ku ew bi ser Rûsya de biçin. Lê li hem-ber hev bin an na, pîrs pîr retorîk e.



Bi edebîyatî tewr baş û rind kerdişê welatêk


Welat Ramînazad

Îmajî îmgeyê parzemînê Afriqaya ke mi de virazîyayo: Seka heme cayê Afriqa rîpraşt û dumduz; çol o, wişk û wehd o, demserrê zî tim hamnan o, hertim germ o, aw çin a, tim weyra de xela esta, ha vêşanî ver mirine, insan bêkeyf û neşad î, hetê teknoloji û endustrî, modernîte ra apey mendeyî; seka no diyardeyî qe weyra de çin î, qabile û êşîrê prîmitîf, bi îfadeyo ziwanê kuçeyan barbar, yamyamî, wehş û hov î; goştê yewbînan wenî, kultur û edetê înan ecip estî, nêweşî û janî zaf î û tarûmakerdiş û dizdeya kolonyalîzama sey dewleta Almanya, Franss, Înglîstan sey fotografan aqilê mi de diyar benî.

No îmaj û îmge mi de senî virazîyayo. Yew bi belgefilm û filman virazîyayo, di seba hetkarîya Afriqa fotografanê ke danî bîlbordan ro, hîrî fotografê Kevin Carterî ke qertelek pawêno ke gedeyêk vêşanî ver bîmîro û ey biwero û çar zî diskorêk esta ke derbarê Afriqayê de no îmaj û îmgeyî vîla kerda û newe ra newe afînêna.

Labêla no îmaj û îmge xelet o, raştî ra dûr o. Reya verîn mi ke ser o muzîka wendiş kerdene ez ke raştê bihêzî û qedîmîya tradîsyona muzîka afriqayê amêyo no îmge û îmajê de mi şiktayîşek virazîyaya. Mi ke kitabê Rizgarkîna Hiş Ji Mêtîngerîyê ê Ngûgî Wa Thiong' o bi kirdasî wendî, no îmge û îmajê hîna zaf şikiya. Hetobîn ra zî başbîyayîşê no kitabî ver mi da kitabane ey bînan. No kitaba pa hîrî zî romanê ey açîrîyayê tirkî: Kan Çiçekleri, Aradaki Nehir û Bir Buğday Tanesi. No rojan de mi Kan Çiçekleri wendî. Wendişê no romanî no îmge û îmajê mi serobîn kerdî, ser o tarîx û cografya û kulturê Afriqa de mi de meraq viraştî, verê mi tada ke ez derheqê Afriqa de cîgêrayîş bikero.

Sey xebatê edebîyat, muzîk, sî-nema, huner û qadên bînê zanîstanê welatê kolonîyan û neo-kolonîyan tim bala mi ancênî, ez hertim hewl dano ke xo biresno înan, wendişan û cîgêrayîşan bikero, seba fehmkerdiş û analizkerdişê bindestî û kolonîbîyayoxê ma




înan ra sûd bigîro.

Kolonîyalîstan ra verî, wextê kolonyalîstan û kolonyalîstan ra dima; neo-kolonîyalîzm û post-kolonîyalîzmî zî na serdemî ra vajîyêno hîrî serdemê welatek estî.

Roman Kan Çiçekleri de nuştoxî, serra 1963 de xoserîbîyayîşê Kenyayî ra dima konjektör û rewşa duyêş serîya verîn a xoserî aye hetê sosyolojîk, psîkolojîk, ekonomîk û polîtîk ra probamatîze keno. Labêla vîrvîstîşê verî kolonyalîzm û wextê kolonyalîzmê zaf estî sey dewlemendî û averşîyayîşê tarîxê Kenya verî kolonyalîstan, dewlemendîya binerd û sererdê Kenya û Afriqa... Bi înan kî mîyanê serdeman de muqayeseyan kenî.

Merdimêko bindest û kolonîbîyayê ke no romanî biwano, xo ra biperso, "rojêk ma ke xoser bîyî gelo dewleta ma zî sey Kenya bo?" Sey nîmune rewş û konjektörê Kenyayî ma çi qas şîyênî bi umumî bikerî? Her dewletê ke xo kolonyalîzmî ra xoser kerdo gelo tecrube, rewş û konjektörê înan heme sey Kenya yê? Gelo eksê nîmuneya Kenya,



nîmuneyê dewletê demokratîk, azadî-waz, serkewte û averşîyayê estê?

Romanê Kan Çiçekleri de dewleta neo-kolonîyala Kenya ha senî yew rewş û konjektörî de ya?

Merkezê romanî de xorexnerkerdiş û rexnerkerdiş, ciperskerdiş û proble-

matîzekerdiş kapitalîstî, olîgarşîkî, avernêşîyayî, nedemokratîkî, bêdaletîya Kenya esto. Romanê de ma dewleta kapitalîsta wehşîya Kenya vênênî. Derheqa konjektörê Kenyayî de hetê ekonomîkî ra mabênî çîna karker û grubêk zengînan sey qîlêk û koyêk abîyo; se ra

95î Kenya karker û dewij, gettoyîjê feqîrî, se ra 5î zî olîgarşîya dewlemendan a. Mîyanê feqîran û zengînan sey newelek xorîn o. Mekanîzmaya dewletî zî seka teyna seba sevekneyîşê berjewendîyanê no olîgarşî esta. Hetobîn ra zî mîyanê bajar û dewe û çolterî de zaf hetan ra sey berdişê xizmeta sosyâlî, cîyatîyê gird estî û mîyanê înan de pêrodâyîş estî. Dewe û çolterî, xêncî bacegirewtîş seka ke dewletê ê cayî xo vîr ra kerdî.

Bextîyar Elî ropartajêk xo de va; "Ma Saddamî ra dima çîyo ke ma xeyal kerdênî, no hetê ra ma şiktayîşêko serobînkêr dîyî." Ngûgî wa Thiong' o şiktayîşê înan qebul keno labêla no şiktayîşê melankolîze nêkeno, ver şiktayîşê bînkewtîş qebul nêkeno, nêvano mi rê çî lazim o û pašta xo nêdano, bi rêşbînî, bi bêhêvî, bi bêbawerî, gere û gazind, lome nêzdîyê no şiktayîş nêbeno û ey nênîrxnêno. Bi rasyonallîstî û realîstî, bi persan û rexneyan raşt û azadker nêzdî şiktayîşê înan beno, xo rexne keno û muhasebeyê xo keno, gêrêno çareserî û serkewtîş û bedelnayîşan.

Heto ey yo bîno tewr giring Ngûgî no ye ke şiktayîşê ra karakteranê bohe-man, melankolîk, vindîkeran, mazoşîstan, mucadelenêker û qebulker nêafîrnêno. Mekanê romaî dewa İlmo-rog û karakterê serekeyê romanî Abdulla, Munira, Karega û Wanja yî. Şîrkîya karakteran na ye ke hemîn nêheqî û bêadeletî dîya. Bi no romanê xo o qesasê bêadeletî gêno, adeletî, bihêzê û pêtêr keno û vano, "mucadel ha dewam keno."

Cayêk romanî de sey na cumle: "Ma Kenya xoser kerdî, nika zî ma Kenya azad kenî." Cumleyêk vîrêna. Na cumla seka armanca nuştoxî xulase bikero. Armanca ey na ya ke, bi no romanî şarê Kenya hişyar bikero, dewleta Kenya bibedelno û bi edebîyatî Kenya bikero tewr dewleta rind û baş, averşîyayê û biadaletê dinyayî. Nuştoxî, bawerîya edebîyatî zî keno.

Ganî mîyanê edebîyat, muzîk, sî-nema, tîyatroyê qadê ma yê bînan ra sey Thiong' o nuştox, hunermend zan-yar bivejî la senî?!..

Roja Ziwanê Dayike

Mehmet Seyîtalîoglu

Qelesa xo girewte xo dest. Der û dorme xo de nîya da. Çeye de ez û ju kî hevala mi esta. Kamî ra qesê bikîme, çî vajîme. Domanî ma ra dîrî yê. Ewro ê çî fikirênê nêzana?

Badê roja ziwanê maya xo, piroz kerdene zerê mi ra qet derbaz nêbîyê. La qey, çito, se î na şaş xuyîne? Ma se şabîme ebe nê halî û ziwanê xo de.

Ma welat ra koç bîme, şîme welatê şarî. Ma adet û torne xo ra kî û kultur û zonê xora kî ebe no tore kewtîme dîrî. Xo xo de qesey kena. No halê ma beno çî? Ma na bêzonîya xo de se benîme haşt, se bemîme ser raşt.

Pîrozbîyayîş teyn bi ebe şeq şeq nêbeno. Pîrozkerdene ewilî wahîrbîyayîş a. Çito zonê xo ra wahîr wejîme.

E juyîne; hetê heq û huquqî ra çîyêde ma çin o. O taw gama verêne çeyê xo de bierzîme. Kal û pîranê xo de

tim û tim qesey bikîme. Domananê xo de qesey bikîme. Nas û dostê ma yê ke yenê meymantîya ma ha zaravaya kurmançî bo ha zaravaya kirmanckî bo, qalanê xo ebe zonê maya xo mobet bikîme.

Rojname û kovarê ke ebe zonê ma amey nuştîş înan biherînîme, biwanîme û bidîme wendene. Nuştîya wendiş de çiyedo newe, problemêko bîn vejîno. Alfabeya newîye de elfaba zonê ma yenîme tê rî. Herfî, telafuze tirkî zonê kurdî ciya ro. Bê guman nê nuşteyî de ma ê karî nêşkinîme derg a derg salix bidîme. Ma rê endî gere ju zono zanaye reyberîye bikero. Ma bivata goşdarîye fam kenîme. Çimke ma hetanî nika ebe vate zone xo ardo na duşte.

Ê didinî; çîxa ke binê bandora kolonyalîst derîme neşîratê ma binuşte nîyo. Hetanî nika televziyonan, û komelayanê ma de û nimune; kurî-deran de na merhala de xeylê raye girewta. Ma bi cat û înatê xo na şaxe ser çîqa

wayîr bîme honde ca danîme zonê xo honde zonê xo vindî bîyayîş raxlesnenîme.

Goşdarîya kal û pîranê xo bikîme. Çîrokên û ciwîyayîşê şaran de û çete mîyan de çî derbaz bîyo, nînan ser o qesey û mobeta bikîme. Cit û cobaran, mal û milk ra, şîyayena wara û dagere wara çî bî, çî ma ser a derbaz bî nê pero meseleyî cuya ma yê. Doman amey dinya. Nak birnayene, name panayene, beşîge şanîtene, û lorî kerdene, û cuya domanî de neweşîye û weşîye û kay û kelebute çî ame vîrnîya domanan. Demo ke ne qîja newa zon kerd, ma ci rê se alîkar bîme. Ma zonzanay, doman kî newe na derheq de game erzeno. Tecîhkerdişê ma gere zonê ma bo.

Tercîhkerdiş aqil û famê kolonyalîstan bo, yanî 'türkçe konuş kendini kurtar' asîmîlasyon ke kewto zerey şarî, endî luzumê nîjadan nêmaneno. Endî ey armanca xo de resayî ci. Luzumîya înan çin a. Ma bi xo benîme axuye koka



xo û şaranê xo.

Ebe se serra ma de şer der ê seba çinkerdena kurdan, seba nasname û kamîye. Çimke zon nasnameyê şaran o. Şanoya û kulturê ciwîyayîşî yo. Îtîqat û

rewşa bîyayîşê û lorka û kilama, haylême, û ciwina.

Eke ma zonê xo, xo vîra kîme, benîme çin.

Eke zonê ma bibo, o taw ma estîme.



Kewê Redkan

Helîse û rûnê nîvişk

Diya min û meta Zerê, her tim bi hev re diketin pêşbirkê. Diya min digot; helîseya herî xweş û rind ez çêdikim. Meta Zerê jî digot; te-eeew, ya herî xweş ez çêdikim. Dema ez helîseyê çêdikim hemû der û cînar dixwazin wek min çêkin.

Tu zingê (hestiyên lingê dewaran; çêlek, golik û ga) dewarên pîr davêjî navê, ez ên ciwan davêjim navê, lewma helîseya min ji ya te xweştir e. Yek ji wê û yek ji wê, her tim rojên wan wisa derbas dibûn. Lê li aliyê din jî hevaltiya wan a salan hebû, tu carê dilê hev nedîşkandin. Bavê min jî ji helîseyê hez nedikir, hemû xwarinên wî gerek goştê sor di nav de hebûya, lê wekî din, xwarina bêgoşt nedixwar.

Diya min jî qet guh nedida gotinên wî û hema di malê de, di kîlêra wê de çî hebûya ew çêdikir. Xema wê nîn bû, bavê min ji wê xwarinê hez dike an na?

Ê meta Zerê, hema wê çî xwarinê çêdikir mêrê wê nedigot ev çî ye. Bi lepan dikete ser wê xwarinê, wê jî bi dilekî rehet hemû xwarinên ku jê hez dike çêdikirin. Dîsa rojekê diya min û meta Zerê xwestin helîseyê çêkin, lê ne li çarsiyê û ne jî li malê zing tunebûn bikin nava wê helîseyê. Fikrên diya min her carê cuda cuda hebûn, digot; ew nebû, ez ê yeke din çêkim.

Meta Zerê jî hema hemû xwarinên xwe dineqîşandin, te digot qey tu li aşxaneyê li qesreke mezin wan xwarinan çêdikî. Diya min got; ne li malê û ne jî li çarsiyê zing tune ye, ez ê vê carê jî bi goştê mirîşkan çêkim. Meta Zerê jî got; ez ê jî bi goştê dîkan çêkim, ka em binêrin helîseya kê ji me vê carê xweş dibe! Yekê bi goştê dîk a din bi goştê mirîşkê helîseya xwe çêkir. Meta Zerê rûnê nîvişk danî ser helîseya xwe, diya min jî wek her tim rûnê helandî, gizirk gizirkî danî ser helîseya xwe. Jixwe tu çî bidî ber mêrê meta Zerê, nabêje tal e an tirş e, hema dixwe, lê bavê min di nav de dibijêre, ev tal e û ev jî tirş e.

Diya min got; vê carê ez ê helîseya Zerê bidim ber mêrê xwe ka çî dibêje. Bavê min helîse tam kir, hema bi kevçiyên ket ser û binê tasê çîl û qerqaş kir. Vegeriya ji diya min re got; ev hezar sal in ku te helîseyek wiha xweş çênêkiribû, ka binêre tam ev e, helîse divê wiha bê çêkirin. Ne gotin, te digot qey bavê min keviran li ser serê diya min dibarîne.

Wê got; ev ne helîseya min e, ev ya Zerê ye, goştê dîkan di nav de heye, dikên wek te nikuldîrêj. Got û xeyidî û çû mala bavê xwe, sê rojan nehat, heta ku bavê min çû li bergeriya, bi vir de û bi wê de. Jê re got; ez careke din qerfên xwe bi xwarina te akim, lê rûnê nîvişk jî tama wê pir xweş kiribû. Piştî sê rojan bavê min çû diya min ji mala bavê wê anî. Niha diya min çî xwarinê û zêdetir jî helîseya ku çêdike û rûnê helandî dide ser, bavê min madê xwe qet tirş nake û ji tîrsa diya min bi kevçiyên dike ser. Helîse bi rûnê nîvişk jî xweş dibe.

—Aleo

Kiro lawo bes çiqoletan bixwe, te hemû qedandin...

Bisekine lê dayê keça ez jê hez dikim ji çiqoletan hez nake.

Keçik jî ev e dayê... Çawa ye, ket serê te?

Ket serê min, lê ev keçika delal çawa li te nêriye, min ew fêhm nekir!

Waye hebek maye, ez wî jî bixwim.

Binêre dayê, mala keçikê ev e.

Min çiqolet xwarin, kulîlk jî ji bo te.

Tu yê çiqoletên min bixwiyî ne, tu yê niha bibînî kero

Gerek te kulîlk jî bixwara, tu wekî golikan î!

Wîî kur û kemê, vî golikî qehweya tûj jî vexwar, qet ne xema wî ye jî!

Tiştanok (mamik)



1-Mamê Mino mamani Tiştêk min heye bi şevê yar e, bi rojê neyar e? De bêjin ev çî ye?"

2-Tiştêk min heye Biharan bûk e Havînan sûk e Payîzan pepûk e

3-Tiştêk min heye Binî şîr e vedixwim, Serî mêrg e diçinim Serî spî ye, kulav zêrin e

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvi me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn jî kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

Çavkanî: Mamikên Botanê

Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî

Bersivên me ev in:

1- Nivîn, livîn 2- dara fêkîyan 3- Pêz

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pîrsa xwe ya her tim bipîrsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:

Min ji vir va da nêva şova Şahîne şivesorî
Ez ji wê va hatim
Min da nêva şova şahîne şivesorî


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:

Min zû got
Wê pez dot
Wî nan sot
Wan kir cot

Çavkanî: Zûgotinok
 Berhevkar: Mihemedê Kurdo



XAÇEPIRS



Jİ ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- Hindik 3. Tayên raçandî yên ji bo masîgiriye; şebeke
- Parçeyek ji gewdê mirov an jî zindiyan, endamekî laş
- Apê min tê ji deştê barek stîrî li piştê... bersiv çî ye? 7. Heq
- Qada ku pûş an jî genim lê tê biçihkirin 12. Ne tarî, rewşen. Her wiha navekî kuran e
- War 15. Navçeyêke Amedê 17. Awayê tewandî yê cînavkeke pirhejmar
- Bersiva neyînî 22. Sernav

Jİ JOR BER BI JÊR

- Mirovê zerik, çûr 2. Mêtin
- Mirovê ku qirika wî ji ber hewcedariya avê zuha dibe 4. Mûyên çena mêran 5. Ecêb 7. Celebeke kundiran ê serdirêjîk, kundirê...
- Xap, hîle 10. Îca, vê carê
- Êl 13. Dewleteke îslamî ku bi darvekirinan navdar e
- Meşkeke piçûk a ji bo avê dihate bikaranîn
- Xeyal, tiştên mirov di dema razanê de dibîne
- Ji nişkan ve
- Televiyoneke kurdî ya destpêka weşana bi kurdî
- Noteke muzîkê 23. Agir

Bersiva hefteya borî



Destpêka Romana Kurdî: Gotarên Li Ser Romana Êwra Kavkazê

Elif Gun

Ev xebat ji aliyê weşanxaneyê peywendê ve di sala 2020'an de hatiye weşandin. Xebat behsa wêjeya êwra Kavkazê û êwra di navbeyna salên 1920'an û 1991'ê de, ya li nav tixûbên Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (YKSS), li van sê welatan; Ermenistan, Gurcistan û Azerbeycanê.

Wêjeya Kavkazê ji ber ku navê erdnîgariya ku dikeve nav sînoren van her sê dewletên navborî (pişt) Kavkaz e. Dema em li dîrokên hatine dayîn di nihêrin, destpêka damezîrandina YKSS'ê û dawilêhatina wê ye. Ji bo zimanê kurdî ev dem demeke pir girîng e. Nivîskarên vê pirtûkê berî qala xebatên xwe yê der barê wêjeya Kavkazê de bikin di pêşgotinê de bêjeya êwra, Kavkazê hatiye pênasekirin. "Bêjeya êwra (êwir) ji lêkera "êwirî (hêwirî)" ê tê ku bêjeyê xwerû bi kurdî ye û di devoka Serhedê de gelek berbelav e her wiha em gelek caran di berhemên kurdên Kavkazê de jî rastî vê bêjeyê tî. Êwirî (hêwirî) tê wa-

taya bichûn, kondaîn, tebitîn, wardenîn hwd." (r. 11). Bi zanebûn nivîskarên vê pirtûkê bêjeya êwra bi kar anîne ku rehê kurdî ye. Ji bo bêjeya Kavkazê tevliheviyek heye di nav kurdan de. Di nav kurdan de gelek varyantên navê erdnîgariyê yê wekî Qafqas, Qewqaz, Qoqaz, Kafkas, Kavkaz, Qafqasya an jî Kafkasya hene. Her çiqas gelek varyant hebin jî "li gorî zanistan erdnîgariyê navê herêmê PiştKavkas (Transcaucasia) e. Di heman demê de di berhemên êwra Kavkazê de jî wekî PiştKavkaz an jî Kavkaz derbas dibe. Loma me di vê xebata xwe de Kavkaz tercîh kir da ku orjîna wê bê zanîn û tevlihevî bê çareserkerin û xeletbikaranîna wê bê terikandin" (r. 11).

Piştî ku bêjeyan rave dikin tî ser wêjeya Kavkazê. Di vê xebatê de neh gotar hene û hemû jî li ser roman û novelayên kurdî yê êwra Kavkazê hatine nivîsîn. Pirtûk ji çar beşan pêk tê. Gotarên ku hatine nivîsîn, li gorî mijara nêzî hev hatine dabeşkirin.

Gotarên beşa yekem, bi giranî

wekî destpêkê dixuyê. Di vê beşê de piranî wekî panoramaya romana kurdî ya êwra Kavkazê amade kirine. Di beşa ewil de nivîskarê gotara 'ewil, Muslih Sezer e û navê gotara wî Destpêka Romana Kurdî; Panoramaya Romana Êwra Kavkazê (1935-1991) ye. Sezer, di gotara xwe de ji destpêka sala 1991'ê rewş, serpêhatî û geşdana romana êwra Kavkazê hûr vekolandiye. Gotara duyem a beşa yekem, ya Mehmet Nur Yavuzer e. Yavuzer, bi sernavê "Panoramaya Nasnameya Neteweyî di Romana Êwra Kavkazê (1935-1991) nivîsiye. Nivîskar, di gotara xwe de li ser romana kurdî ya êwra Kavkazê, ya di bin sîwana wela-tekî din de, bi ramana realîzma sosyalîst ve hatiye xemilandin û li derveyî axa welatê xwe bişkiyîye, radiweste. Her wiha nivîskar, dikeve pey rêça rengvedanên nasnameya neteweyî di romanên kurdî yê êwra Kavkazê de û wan rêçan destnîşan dike.

Gotarên beşa duyem tenê ji bo gotarên der barê romanên Eliyê Evdilrehman hatine ravekirin. Ev beş bi gotara Dilaver Doger dest pê dike. Doger, qala Romannûsiya Eliyê Evdilrehman dike ku di wê serdemê de romannûsekî girîng ê wê êwra ye. Her wiha nivîskar, berê xwe dide Romana Gundê Mêrxasan û Teknîk û Şeweya Eliyê Evdilrehman a Afirandina Tîp û Karakteran hûr dibe û li derdora romana êwra Kavkazê û teknîka di paça vê romanê de ronî dike. Di beşa duyem de gotara duyem aîdî Ahmet Seyari ye. Seyari, li ser Hewla Avakirina Bêjara Neteweperwer di Romanên Eliyê Evdilrehman de disekine. Gotara sêyem a beşa duyem ya İlyas Sayim e. Sayim, berê xwe dide romanên Eliyê Evdilrehman û mijara xwe ji romanên wî derdixe. Sernavê gotara Sayim, Zordariya Feodalîzmê û Rizgarîya Şoreşa Bolşevîka di Romanên Eliyê Evdilrehman de ye. Her wiha Sayim, di gotara xwe de qala jiyana û berhemên nivîskarê daye danasîn û paşê konstektê berhemên wî de meseleya duqutbiya feodalîzmê û sosyalîzmê bi çî awayî û ji kîjan rewşgeyê hatiye hilsegandin, rave dike.


Di beşa sêyem a wê pirtûkê de du gotar cih digirin. Navê wê beşê Romannûsiya Heciyê Cindî û Şehîdê Îbo ye. Di vê beşê de gotara yekem a Murad Celalî ye. Sernavê gotarê Dahûrînek li ser Romana Hewarî ya Heciyê Cindî di Peywenda Edebiyata Sirgûn û Şahidiyê de. Celalî di gotara

xwe de, li Ermenistanê ketiye pey rêça koçberên kurd ên êzdî ku ji welatê xwe reviyane û çûne wir, her wiha ew koçber car caran bûne şahidên sirgûnan. Nivîskar gotara xwe bi peywenda wêjeya sirgûn û şahidiyê saz kiriyê.

Nivîsa duyem a beşa sêyem a Mehmet Yıldırımçakar e. Sernavê gotara wî; Bi Perspektîfa Hînweriya Lehengên Erênî Tîpê Şoreşger ê Rûs di Romana Kurdî Rêwî ya Şehîdê Îbo de ye. Yıldırımçakar di gotara xwe de romana Şehîdê Îbo ya bi navê Kurdî Rêwî hilbijartiyê û dikeve dî şopa tîpê şoreşger ê rûs û têkoşiyayê ku di bin sîwana hînweriya lehengên erênî de taybetmendiyên sereke rave dike. Her wiha nivîskar, di encama gotara xwe de çespandiye ku romana kurdî ya êwra Kavkazê ketiye bin karîgeriya realîzma sosyalîst, lehengên erênî û neyînî jî tîpê şoreşger ê rûs e ku di romana Kurdî Rêwî de bi awayekî berbiçav tîne berçavê xwîneran.


Beşa dawî yanî beşa çarem ji gotarên berawirdkirina berheman pêk tê. Gotara ewil ya Turkan Tosun e. Tosun di gotara xwe de pêşî Serlehengên Jin di Xezala Sîma Semendê û Mestûreyê Tosinê Reşîd berawird kiriyê. Em di gotara Tosun de, du berhem, du jin û du nivîskaran dibînin. Lêbelê taybetmendiyê wê gotarê nivîskarek mêr e ya din jî jin e. Tosun lehengên jin di paceya nivîskarekê jin û yekî mêr de çawa dixuyê, nîşanî xwîneran daye.

Gotara dawî û duyem ya beşê çarem Cihan Turan e. Turan berê xwe daye teknîka biyografî û otobiyografîyê. Navê gotara wî; Di Navbeyna Dîrok û Edebiyatê de: Teknîka Biyografî û Otobiyografîyê di Romanên Erebe Şemo Berbang û Şivanê Kurmanca de ye. Turan her du romanên navborî ji hêla taybetî û şewaza romanên biyografîk û otobiyografîk ve dinirxîne. Di navbera her du romanên de Şivanê Kurmanca û Berbangê de aşkera dike. Turan her wisa her du romanên jî hêla naverokê ve jî berawird dike. Wekhevî û cudahiyan wan romanên destnîşan dike. Dema ku em li vê xebatê dinihêrin qadên ku di wê pirtûkê de hatine hilbijartin valahiyeke wêjeya kurdî û di kurdolojiyê de dagirtine. Di qada akademiyê de valahiyeke mezin her çiqas ji sedî sed tîjî nekiribe jî dilopek e. Xwezî jinên nivîskar di pirtûkê de zêde bûna. Di nav ewqas zilaman de tenê jinek heye.



Folklorê Qerejdaxê

Parêzer Mehmet Guzeler bi xebateke nêzî 15 salan berhemek folklorîk û herêmî bi navê 'Folklorê Qerejdaxê' nivîsî. Berhevarê berhemê Guzeler gotinên folklorîk ên ku sed sal in tînin gotin, ji nav eşîrên wek qeregeçî, tirk, şêxî, îzolî û alreşî ku li Siwêregê û çiyayê Qerejdaxê bi cih û war in, berhev kirine. Berhevar, nêzî panzdeh salan gund bi gund geriyaye û li cimata gundî û rûspiyana bûye mewan. Gotinên wan ên folklorîk çawa hatine gotin, çawa tîne şîrovekirin, bi zimanê wan ê herêmî berhev kirine û di wê berhemê de anîne cem hev. **AMED**



Dîroka Pêxemberan

Pirtûka bi navê 'Dîroka Pêxemberan' a Ebdulwehhab En-Neccar ji aliyê Mela Tayyîbê Bazîdî ve ji erebî hat wergerandin. Pirtûka ku ji weşanxaneyê Nûbiharê hat çapkirin, ji Hz. Adem heta Hz. Îsa behsa wan pêxemberan dike ku navê wan di quranê de derbas dibin. Ebdulwehhab En-Neccar dema dest bi serpêhatiyên pêxemberê dike, pêşî bi awayê îstatîstîkî diyar dike ka çend navên wan pêxemberan di quranê de borîne, navên wan, sûret û hejmara ayetên ku navê wan pêxemberan tê de borîne rêz dike. Piştî re jî qala qonaxên jiyana pêxemberan bi awayekî berfirehî dike û ayetên der barê wan de dinivîse. **AMED**

Lêkolînek li ser ola yarsanan

Pirtûka bi navê 'Nameya Serencamê Yan Kelama Xezîneyê' ji weşanxaneyê Sîtavê derket. Pirtûk ji aliyê Dr. Sidiq Seffîzade ve hatiye nivîsîn û wergera wê ya kurdiya kurmançî ji aliyê Muhsîn Ozdemîr Sabîr û Ebdulla Hîzad ve hatiye kirin. Ev pirtûka ku li ser ola yarsanan e, yekemîn car e bi kurmançî çap dibe. Nameya Serencamê qala pirtûk û nivîsarên ku sedsala berê yê der heqê Hewramanê de agahiyan dide, bal dikişîne ser dewlemendiya hebûna zana, ronakbîrên herêmê. Pirtûk ji şeş beşan pêk tê. Ev metnên resen ên ku bi goranî wek raz û helbest hatine honandin, bi awayekî zelal hatine latînkirîn. **AMED**



Li dijî tundiya mêran performansa hunerî

Şewekarê bi navê Diyako Xatûn ê ji bajarê Dihokê, li Silêmaniyê performanseke hunerî li dar xist. Şewekarê başûrî bi performansa hunerî bal kişand ser pergala mêran û ferzkirînan wê yê li ser jinan.

Bi taybetî Xatûn bi xebatên xwe yê hunerî, hewl dide tundiya li ser jinên kurd bide nîşandan. Xatûn di performansê de bi boyaxê sor û bi piyên xwe xekekê xêz dike û her diçe wê xekekê mezin dike. Bi vê xêzkirîna desthilatdariya mêran a li ser jinan ku tim jinan di nav xekekê de

dizivîrîne wek 'bazne' bi nav dike. Diyako der barê performansa hunerî de wiha dibêje: "Rengê sor ji bo min tê wateya êşên jinên Şengalê, Sûriyeyê û jinên penaber."

Şewekarê ji herêma Behdînanê diyar dike ku piraniya xebatên wî li ser rexnekirina zayendparêziya civakî, tundiya li dijî jinan, êş û azarên ku jin ji ber sedemên şer û tundiya hêzên desthilatdar in.

Diyako Xatûn diyar kir ku wî heya niha ev xebata xwe li Dihokê, Silêmanî û Almanyayê nîşan daye. **SILÊMANÎ**



Dîrok û çîroka navê Amedê¹

Amed Çeko Jıyan

Deng bi zerikê ket çî rast û çî derew.

Min di nivîsekê de behs kiribû bê ka agahiya derew/nerast ya der barê qehweya bi navê “Chicorée au Kurde” de çawa di rojnameyan û wîkîpediyayê de (di ya îngilîzî û fransîzî de jî) belav bûye. Di rastîyê de, tu eleqeya “Chicorée au Kurde” û “qehweya kizwanan” û “qehweya tirkî” bi hev re tune ye, lê yekî li derekê gotiye/nivîsandiye ku ev qehweya dibêjin “qehweya tirkî” berê qehweya kurdan bûye û paşê tirkan ji kurdan diziye û kiriye ya xwe... û agahiya derew wekî tîrekê ji kevana xwe derketiye.

Heke bêjin çî eleqeya vê û navê Amedê bi hev re heye, ez ê bêjin, eleqeya wan ew deng e ku bi zerikê ketiye.

Di meseleya navê “Amed” û “Amîd/Amîda” yê de, tişteki wisa anîne serê me kurdan ku em êdî wisa difikirin û wisa bawer dikin, em bûne dizên sola xwe!

Bi rastî jî navê bajêr ê kevn “Amîd” û “Amîda” bûye û van çend salên dawiyê kurdan navê “Amed”ê lê kiriye? Bêguman na. Lê çima gava em kurd dibêjin “Ame(?)d” em devê xwe wisa xwar dikin ku xelk fêhm neke ka me gotiye “Amed” yan “Amîd”?

Bersiv her çî be jî sedem hinekî tirs e... tirs jî li ser vaxê para bêkes û bêxwedanan e. Dibêjin birûsk li nav komeke mirovan bixe, ew ê ji xwe re yê bêkes û sêwî hilbijêre. Ma ne ji ber ku kurd “sêwî” bûn navê dewleta Merwanî di qeydiyên serdestan de “Merwanlogullari” bû û heman qeydî îdia dikin, “Tirk ji dema Naram Sîn ve li Amedê bi cî bûne” û di ser de jî dibêjin navê “Diyarbakir”ê berê “Diyarbakir” bûye (ango ev nav ji “bakir”a tirkî tê) û ji ber alfabe û “şîweya erebî” bûye “Diyarbakir”. Lê em (bi saya gotareke mamoste Fêrîng Melîk Aykoç) ji Herodot dizanin, dîroknivîs jî derewan dikin.

Bi çend hevokan kurte dîroka bajêr

Li ser dîroka Amedê gelek pirtûk û gotar û tezên ji bo lîsansa bilind û ji bo doktorayê hatine nivîsandin. Bi xêra înternetê min xwe gihand gelek nivîs/pirtûkan. Mirov dikare bêje, ji bilî rêzenivîsên Xerzî Xerzan û gotara Prof. Dr. Canan Parla, hema bêje hemû gotarên din kopiyên beşên pirtûka Şevket Beysanoğlu û wîkîpediyayê ne. Jixwe li

gorî standardên zanistî yê Tirkiyeyê kesekî dikaribe “kopî/paste” bike dikare li ser hemû mijaran teza doktorayê jî binivîse.

Dîroka bajêr di hemû çavkaniyan de hema hema wisa ye:

1. Bajar ji aliyê Hurî-Mîtanîyan ve hatiye avakirin.
2. Qralê Asûran Adad Nirariyê 1'ê welatê Hurî-Mîtanîyan dagir kiriye, li ser şûrekî ku ji dema wî maye “Amîd” dinivîse.
3. Dîroknûsê Romayê yê ji Antakayayê Ammianus Marcellinus di pirtûka xwe de navê bajêr wekî “Amîda” nivîsandiye.
4. Heta serdema îslamê navê bajêr “Amîda” bûye, paşê bûye “Diyarbakir”, di sala 1937'an de jî ji bo xatirê Atatürk navê bajêr kirine “Diyarbakir”.
5. Îdiayeke dawiyê heye ku wekî îdiaya di pirtûka Şevket Beysanoğlu de ye (bekir/bakir). Li gorî vê îdiayê navê bajêr berê “Tîkranokerta/Dîkranagerd” bûye û paşê çend tîp guherîne û bûye “Diyarbakir”.

Li gorî encamên lêkolînên arkeolojîk, rast e ku bajêr ji aliyê Hurî-Mîtanîyan ve hatiye avakirin. Lê agahiyên din? Ez niha ji we re bibêjim, hemûyan konê xwe li ser derewan ava kiriye, hûn ê bawer bikin? Na? Nexwe em bipirsin, kî şûrê Adad Nirarî dîtiye yan dizane li ku derê ye ku dibêjin li ser “Amîd” dinivîse? Erê, Ammianus Marcellinus “AMIDA” nivîsandiye, lê ma em nizanin hemû alfabe yê latîni wêkî hev nayên xwenedin? Gelo “bir” bi kurdî çawa tê xwendin û bi tirkî çawa tê xwendin? Çima em ê “AMIDA”ya latîniya dema Ammianus Marcellinus bi tirkî wekî “Amîda” û bi kurdî wekî “Amîda” bixwînin? Çima kes nabêje li gorî lêkolînên arkeolojîk Tîkranokerta/Dîkranagerd li ku derê ye? Çima kes behsa nivîsê jî serdema Asûran mayî nake?

Rastiya Tîkranokerta/Dîkranagerdê

Ez hema bi kurt û kurmançî bêjim. Ez jî gundê Cimzerqê me û navbera gundê me û bajarê Dîkran 2 km tune ye. Ji bo pesendkirina agahiyên û şewîrînê ez bi her du nivîskarên hêja mamoste Merdan Newayî û mamoste Mem Xerzan re axivim ku ez û mamoste Newayî gundiyan hev in û mamoste Xerzan ji Telîba ye ku ev gund di nav sînorên Tîkranokertayê de ye. (Ji bo



La Rue, P. D., Somer, J. & Mariette, P. (1651) Assyria vetvs diuifa in Syriam, Messopotamiam, Babyloniam, et Assyriam. Paris: Sumpribus Petri Mariette Lutetiae. [Map] Retrieved from the Library of Congress, <https://www.loc.gov/item/2004629154>

agahiyên hêja spasîya her du mamoste yê hêja dikim)

Gundiyan gundên derdorê jî berê ve ji kaviên Xirabajar gelek pereyên ku dibêjinê “polikên Dîkran” derxistine û ji berê ve ji wê derê re dibêjin “bajarê Dîkran”. Ev agahiya gundî jî berê ve pê dizanin, ji aliyê zanistî ve jî di encama lêkolînên arkeolojîk de hatiye pesendkirin.

Îdiayên li ser navê Amedê

Em hemû dizanin, îro di nav gel de “Diyarbakir” ji “Amed”ê zêdetir tê bikanînin û heçî navê “Amed”ê ye, her çend beriya PKK'ê hebûye jî bi riya PKK'ê li seranserê Kurdistanê belav bûye. Ji ber vê yekê ye, gelek kesên dijberên PKK'ê ku hin ji wan yên xwe wekî “dijberên mêtîngeriye” pênasê dikin jî navê “Amed”ê qebûl nakin û jî devla vî navî ve navê “Diyarbakir”ê tercîh dikin. Di ser de jî îdia dikin ku navê bajêr “Amîd” bûye û dîroka navê “Amed”ê bi dîroka PKK'ê re dest pê dike.

Hin kesên din îdia dikin ku navê kevn “Amîda” bûye û bi zîmanê asûriyan bûye. Wekî hemû nivîskarên teztên zanistî (?) çavkaniya îdiaya wan Şevket Beysanoğlu ye ku wî nivîsandiye “**Adad Nirariyê qralê asûran li ser destkê şûrê xwe ‘Amîd’ daye nivîsandin**”. Lê Beysanoğlu di heman rûpelê de wisa jî nivîsandiye: “**Di berhemên erebî de jî**

bi piranî wekî Amed derbas dibe.” Mixabin kes behsa vê nake... ji bilî Prof. Dr. Canan Parla û malpera walîtiya Amedê ku tê de nivîsandiye “**Li ser destkê şûrê hikumdarê asûran Adad Nirari I (1316-1281 B.Z.) Amîdî yan Amedî hatiye nivîsandin**”.

Mixabin li gel vê agahiya walîtiya Amedê jî Weqfa Mezopotamîyayê ku bi pirtûkçeyî xwe ya li ser gramera kurdî zirareke mezîn de standardbûna kurdî, di wê pirtûkçeyî xwe de di lîsteya navên bajarên Kurdistanê de “Amed” nenivîsandiye. Li gel ku Batman (Êlih) û Entab (Dîlok) bi du nava hatine nivîsandin, bajarê Amedê (di rûpela 27'an de) wekî “Diyarbakir” tenê hatiye nivîsandin.

Lê bêguman her kesekî bi xwendin û nivîsandinê kurdî re eleqedar e “Li Gornistanek Amedê” ya apê Osman Sebrî dizane.

Ev hemû jî nîşan didin ku navê Amedê ji PKK'ê fêr nebûye lê PKK navê Amedê jî gel fêr bûye û li vî navî xwedî derketiye û li seranserê cîhanê belav kiriye.

Navê bajêr di nexşeyên kevn de

Em hemû dizanin dîroka nexşeyan, bi taybetî nexşeyên di standardên nexşeyên îro de gelek ne kevn e. Lê min jî înternetê çend nexşeyên ku tê de herêma me jî heye peyda kirin. Navê

Bi delîlan tê piştrastkirin

Heke hûn dixwazin bi hûrgilî û dîroka bajar û navê Amedê bixwînin, pêşniyara min, hûn serdana malpera hembajariyê min ê hêja mamoste Xerzî Xerzan (www.dirokakurd.blogspot.com) bikin û rêzenivîsên wî yê li ser vî mijarê û mijarên din ên tîkildarî dîroka kurdan bixwînin. Ji ber ku mamoste bi delîlan nayên înkarkirin ev rastî îspat kiriye. Armanca vê nivîsê ya sereke ne dubareya heman delîlan e. Ez ê hin jî heman delîlan û delîlan nû pêşkêş bikim û bikevim pey çavkaniyên îdiayên ku heta niha wekî rastî dihatin qebûl kirin.

Amedê di van nexşeyan de wekî “**Diyarbakir, Diyarbakir, Amîda, Amada, Amet û Ameda**” hatiye nivîsandin. Ji ber ku nexşeyên tê de “Amîd” û “Diyarbakir” dinivîse ji yê din zêdetir in û xweş peyda dibin, ew di vî nivîsê de nehatine nîşandan.

Çavkaniyên jî van nexşeyan kevintir pirtûkên dîroknivîsên sedsala 7'emîn Teberî û Dînewerî ne. Di van pirtûkan de navê bajêr bi tîpên erebî wekî “آمد” hatiye nivîsandin ku îhtîmal e ew wekî Amed, Amêd yan Amid bê xwendin. Îhtîmal e ji ber vê yekê, wekî min li jorê nivîsand, Ş. Beysanoğlu di pirtûka xwe ya navborî de nivîsandiye “Di berhemên erebî de jî bi piranî wekî Amed derbas dibe”. Wekî din, di berhemên farisî de jî li gel “Amîd”ê wekî “Amed” jî derbas dibe. Di malpera Encyclopaedia Iranica de di du gotaran de ku tê de behsa Amedê tê kirin, gava behsa çavkaniyên erebî tê kirin wekî “Amed” hatiye nivîsandin lê gava behsa çavkaniyên rojavayî tê kirin wekî “Amîd” hatiye nivîsandin. Di vî ansîklopediyê de bi navê “Amîda” jî gotarek heye û wisa dest pê dike: AMIDA, Pers. Āmed (modern Dîrbakr) Bi kurdî: **AMIDA, Bi farisî Amed (“Diyarbakir”a niha).**

Di beşa duyemîn de:

- “AMIDA”ya bi latîni
- Şûrê Adad Nirari yê 1'emîn
- Nivîsên din yê jî serdema asûran



Jean Baptiste Bourguignon d'Anville (1794) Nexşeya Asyaya Biçûk di serdema antîk de, www.bit.ly/39EBCYT



De L'Isle, Guillaume (1715) Împeretariya Romaya Rohilat ya li bin serweriya Constantine, www.bit.ly/3cMG6pt